



Şano, divê bersiva têkoşînê bide

R. 8-9

Nûçe:

Eniyeke anti-emperyalîst
pêwîst e

R. 3

Samî Berbang:

Bi zimanê mêtîngeran
civaka azad nayê afirandin


R. 4

Vengûvaz:

Serokê Giştî yê HADEP
girotiya binçim

R. 13

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Êrîşa li ser HADEP'ê û konseptê MGK'ê

Sedema êrîşên dewletê jî geşbûna tevgera kurdan a li metropolan e, kurd hêdî hêdî sazî û rêxistinên xwe bi rêkûpêktir dikin û bi çalakîyên xwe derbeyên mezin li konseptê dewletê dixin.

Ev çend hefte ne, hêzên dewleta tirk berê xwe dane saziyên kurdan ên legal. Heftaya çûyî li Stenbolê hêzên dewleta tirk êrîşê birin ser gelek şaxên HADEP'ê yên Stenbolê û gelek kes binçav kirin. Vê hefteyê îcar hedefa êrîşan navenda HADEP'ê û şaxên li Enqereyê bûn. Di êrîşa pêşîn de bi tenê sê kes hatin girtin, lê roja pêncşemê careke din êrîşê birin ser navenda partiyê û hemû kesên li wir hatin binçavkirin. Di nav wan kesan de Serokê HADEP'ê Murat Bozlak jî heye.

Gelek sedemên van êrîşan hene; yek ji wan sedeman ev e; rayedarên dewletê demekê berê xwe dan derdorên îslamî û Partiya Refahê. Hinek kes bi vî yekê xapiyan, gotin wê dewletê li ber tevgera kurdan a legal veke. Lê her çiqas rayedarên dewleta tirk, piştî civîna MGK'ê ya 28'ê reşemîya 1997'an tevgera îslamî wekî hedefa yekemîn bi nav kiribe jî, êrîşên li dijî tevgera kurdan kêm nebûn. Kuştin û windakirina mirovan bi gurehî dom kir. Jixwe di wê

civînê de digel hêzên îslamî, tevgera kurd jî wekî xetere hatibû binavkirin. Heke mirov vegere mijara sereke, niha dewlet gihîşt wê baweriyê ku bi girtina RP'ê tevgera îslamî ji holê rabûye, ji ber vî yekê jî, ji nû ve bi tundî êrîşê dibin ser saziyên legal ên kurdan.

Sedema duyemîn girêdayî konseptê marjînkirina tevgera kurd e. Êrîşên li ser saziyên demokratîk pêşî li Kurdistanê dest pê kir. Armanca ew bû ku tîkiliyên gelê Kurdistanê bi dinyayê re bibire û rê nede ku dengê gelê bakurê welêt bigihêje dinyayê. Lewre jî saziyên mîna, İHD, NÇM hatin girtin. Di pey re bergeha hêzên dewletê firehtir bû, saziyên li herêmên nêzîkê welêt (mîna Çukurovayê) jî bûn hedefa êrîşan. Rê li ber geşbûna çalakîyên NÇM'ê hate girtin. Di vî navê de qedexeya li ser Ûlkede Gündemê hat.

Armanca dewletê diyar e, dixwaze di nava çend salan de tevgera kurd bike tevgera bêbandor. Niha rayedarên tirk bawer dikin ku li Kurdistanê gihîştine encamekê, lewre jî berê xwe didin

saziyên kurdan ên li metropolan.

Sedema vî yekê jî geşbûna tevgera kurdan a li metropolan e, ji ber ku bi taybetî li metropolan, kurd hêdî hêdî sazî û rêxistinên xwe bi rêkûpêktir dikin û bi çalakîyên xwe derbeyên mezin li konseptê dewletê dixin. Dewlet dibîne ku bi lezgîniyê hinek bergiriyên negire, wê metropol jî bibin qada serhildanan. Bi taybetî merasîma ku ji bo Adnan Şeker pêk-hat, tirseke mezin xist dilê rayedarên tirk.

Li aliyê din hêzên dewletê demekê ji HADEP'ê hêvîdar bûn, hinek kesan ew hêvî dida wan, lê xebatên dawîn hêviya wan di avê de dibe. Dewlet dixwaze bi girtina rayedarên HADEP'ê yên îroyînê re li ber hinekê din veke.

Li hemberî vî polîtîkaya dewletê tiştê ku bê kirin, diyar e; di vî saziyên kurd gaweke jî bi paş de neavêjin; di her warî de yekîtiya xwe xurt bikin û çalakîyên xwe gurtir bikin. Bi vî yekê mirov dikare hêviyên neyaran di avê de bibe û rê li ber dek û dolabên wan bigire.

Dem bi dor e, geh li jêr e, geh li jor

Ferhengok

ÇIYA MAZÎ

abadîn: mayinde
akam: bandor
alav: navgîn (araç)
bedbîn: reşbîn (kötümser)
bersûc: sanîk
berz: bilind
bergirî: tevdir
bêgavî: mecbûr
bêlayan: bêtaraf
bêpayan: bêdawî, bêsinor
dadmendî: dadyarî, hiqûq
danerwe: hewldan, catkirin
dirîh: dirî, stîrî
diyarker: ayanker (belirleyici)
doman: pêvajo (süreç)
eger: hoy, sedem
ezmûnkirin: ceribandin
geleşçe: kêşe
gencîne: xezîne
girami: hurmet, rêz
guncaw: musaît
gûhûşk: kizilçik
hevberkirin: danberhev, rûberkirin, muqayese
hevdiyarî: dijayetî, zidiyet

himat: hól, meydan
hin bi hin: hêdî hêdî
hinda: cem, nik, bal
hêman: pêker, unsûr
hêma: îmge
heyber: maxlûq
hût: dêw
keysperest: keysfile, oportunist
leng: kulek
mêtinger: kolonyalist
navdêr: îsm (têgiha rêzimanî)
pevdeng: diftong
pêşnûma: proje (taslak)
qewlikbêj: metelokbêj
rênivîs: rastnivîs, îmla
sergîhayî: temam
serinckêj: balkêş
serzîzok: keçel, gurî
siruştî: xwezayî
şîrav: ôzsu
ragihandin: dan û standina agahiyan
tapiş: dil, girî
tırûb: sinor
zêdebahî: nîrxa zêde (artî-değer)
zekem: arsim
zivêr: aciz
zirze: qerase (sürgü)

Îro 16'yê rêbendana 1998'an a. Îro jî Girtigeha Newşehîrê, ji girtiyekî me, nameyek ji min re hat. Di nameyê de li ser rewşa girtibûnê tê rawestî û di dawiyê de peyveke xweş a kurdî hatiye bikaranîn: "Dem bi dor e, geh li jêr e geh li jor e". Em bi tîkoşîna girtiyên serbilind in. Silav li gişan be.

Di 16'ê îroj 16'ê rêbendana 1998'an e. Di TV'yê de û di nûçeyên çapemeniyê de tê ragihandin ku: "Partiya Refahê hate girtin." Di heman kîlîkê de girtina DEP'ê hate bîra min û her wiha hate bîra me gişan. 2'yê adarê, di pêvajoya tîkoşîna kurdan de cihekî girîng digire. Ew bûyer bûye hîmê xebata kurdan ji bo demokrasîyê û kevîrekî qazîbîrê. Ew roj tu car jî bîr nabe.

Belê... Wê demê girtina bi stûyê Orhan Doğan bi destên qirêj, kezeba me şewitandibû, nava kurdên bi xîret peritandibû. Geh hêstir barîbûn, geh hêrsa me wekî Çiyayê Cûdî bilind bûbû, li bin kelehên zilmê diket. Ava çemên Kurdistanê wê

rojê melûl diherikîn, zinarên çiyayan li ber teqînê bûn. Lê gelê kurd jî wê rojê û pê ve jî tîkoşîna xwe bi hêrs û rîka nava xwe domand.

Wê rojê jî gelê kurd digot: Mafê mirovan, wê rojekê ji herkesî re pêwîst bibe; ji bazirganên zilmê re jî, ji bazirganên olê re jî. Lê bazirganên olê, wê rojê çî kir? Gotin: "DEP'ê bigirin, bi stûyê wan bigirin û tîxin zîndanê."

Qet yekî ji wan negotibû, ev li dijî demokrasî û mafên mirovan e: Wê demê gişan tilîkên xwe ber bi asîman vekiribûn û gotibûn; bigirin... DEP ê bigirin! lê îro partiya wan jî hate girtin.

Ji wan kirî ku ku, mafê mirovan ji bo kurdan tenê ye. Ji wan kirî ku, bi ser ewran ketine. Ji wan kirî ku, ew bûne serdest. Haya wan jê tune bû ku, kema-lîstan bi stûyê wan girtine û anîne wê holê.

Haya wan jê tunebû ku, wê rojekê bi guhên wan bigirin û biavêjin ber piyan. Qet yekî ji wan negotibû, mafê mirovan ne wiha ye, qet yekî ji wan, ji fedî-

ya jî (bi taybetî yên bi eslê xwe kurd) negotibûn, ev li dijî demokrasî û mafên mirovan e: Wê demê gişan tilîkên xwe ber bi asîman vekiribûn û gotibûn; bigirin... DEP'ê bigirin! Lê îro partiya wan jî hate girtin. Dem bi dor e, geh li jêr e, geh li jor e.

Dibe ku îro, hinek ji wan derkevin û bibêjin: Ev li dijî mafên mirovan û demokrasîyê ye. Wekî Necmedînê serzîzok dibêje: "Ev biryareke siyasî ye û li pey vî biryarê, hêzek heye, ev tevkujiyeke dadmendî ye." Lê heta ev peyv ji devê wî derket hasil di Musilê re derbas bû. Ji xwe rayedarên vî parti-

yê gelek ji wan girsoya xwe dixapînin û bi dengên wan tîrikê xwe tijî dikin. Mirovên belengaz, ku li pey wan diherin jî wê rojekê bibêjin: "Heta me xwe nas kir, me malê xwe xilas kir."

Di 16'ê em dibêjin mafên mirovan ji herkesî re pêwîst e. Di 16'ê em dibêjin divê kurd kar û barê xwe ji her demê bêtir bikin. Lewre azadî bi qasî gaweke nêzîk bûye. Êdî tu hêz û tu kes nikare rê li ber azadiya kurdan bigire.

Ji bo dewleteke kurd eniyeke anti-împeryalîst pêwîst e

Fermandarê ARGK'ê Osman Öcalan: "Armanca dewleta tirk, li Başûr avakirina dewleteke tirkmenan e. Bingeha dagirkerinê hatiye danîn. Sewqiyatên leşkerî dibin. Niha di rêzê da hêzên mezin hene. Ev hêz dikare PDK'ê jî tasfiye bike." Öcalan axaftina xwe wiha domand: Wê Tirkiye di nav vî agirî de bişewite û winda bibe.

Di van rojan de tevî gelemşeya di navbera DYA û Iraqê de, kurd jî ketin rojeva Cihanê. Di gelek rojname û kovaran de li ser senaryoyên piştî şer tê rawestîn û hinek îdia dikin ku wê li bakurê Iraqê (başûrê Kurdistanê) dewleteke kurd bê avakirin. Bi taybetî Tirkiye jî vê yekê zor ditirse. Piştî daxuyaniya Ecevit, a ku gotibû 'Wê DYA li bakurê Iraqê dewleteke kurd ava bike' nivîskarên rojnameyên tirk di nivîsên xwe de bi awayekî berfireh li ser vî mijarê gotar nivîsîn. Piştî van gotar û daxuyaniyan rayedarên DYA'yê ragihandin ku armanca wan bi vî êrîşê ne avakirina dewleteke kurd e. Piştî vî daxuyaniyê jî nivîskarên rojnameyên tirk digel gelek rayedarên dewletê şik û gumanên xwe anîn zimên.

Li aliyê din Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK) jî daxuyaniyên balkêş didin. Li gorî daxuyaniya jî fermandarên Qada Başûr ên ARGK'ê Mehmet Zagros da zanîn ku, piştî êrîşa DYA'yê wê valahiyek li Başûr çêbibe û wiha axivî: "Ji vî valahiyê kurd dikarin îstifade bikin. Hêzên kurd (bi taybetî jî PDK) heger bi hêzên dagirker re nebin yek, kurd dê li Başûr jî Kerkûkê heta Musulê wê bikaribin bixin bin destê xwe." Dîsa Zagros daxuyand ku partiyên kurd heger berjewendiyên xwe deynin aliyekî, ew derfetên ku kurd li Başûr dewletekê ava bikin, hene. Bi vî daxuyaniya ARGK'ê, nêrînen ku li başûrê Kurdistanê li dijî avabûna dewleteke kurd in, pûç derketin.

Osman Öcalan: Wê Tirkiye bişewite

Her wiha dîsa jî fermandarên Qada Başûr ya ARGK'ê Osman Öcalan jî derbarê rewşa şer de diyar kir ku, li cihanê hemû dewlet dikarin ji bo bextewariya kurdan tiştêkî bikin, lê tenê dewleta tirk li başiya kurdan nafikire. Öcalan wekî minak jî 3.5 milyon kurdên ku ji aliyê dewleta tirk ve hatine koçberkirin da. Öcalan wisa got: "Armanca dewleta tirk, li Başûr avakirina dewleteke tirkmenan e. Bingeha dagirkeriyê hatiye danîn. Kêr hindik sewqiyatên leşkerî dibin. Niha di rêzê da hêzên mezin hene. Ev hêz dikare PDK'ê jî tasfiye bike." Öcalan di dawiyê axaftina xwe de li ser berxwedana gerîla rawestiya û daxuyand ku wê Tirkiye di nav vî agirî de bişewite û winda bibe.

Piştî êrîşa DYA'yê wê Tirkiye nêzikî 15 km. bikeve nav başûrê Kurdistanê, ev


yek ji aliyê raya giştî ya şoreşger û welatparêz ve wekî dagirkerî tê binavkirin. Tê gotin ku armanca dewleta tirk Başûr dagir bike. Her çiqas rayedarên dewleta tirk dibêjin: "Em neketine Başûr, me ji bo koçberiyê bergirî standiyê jî Rektore Zanîngeha Azad Fikret Başkaya da zanîn ku Tirkiye ev demeke dirêj e ku ketiyê Başûr û artêşa tirk li Başûr bi cih bûye. Lê balkêş e ku rayedarên PDK'ê jî ragihandin ku pêwîstî bi herêma tampon tune ye.

Helwesta welatên ereb

Li ser politikayên li dijî Iraqê dewletên ereb jî daxuyaniyên balkêş didin. Dewletên Erebiyên Yekbûyî li ser wan xwedî tesîreke mezin e, li dijî politikayên DYA helwest girt û niha ji bo çareseriyêke diplomatîk têdikoşin. Tevî vî yekê Awistûrya û Zelandaya Nû jî di daxuyaniyên xwe de diyar kirin ku ew li dijî destkariyê leşkerî ne. Li aliyê din rayedarên Îranê jî ragihandin ku wê ew balafrîrên ku di ser erdima Îranê re derbas bibin, bixînin û jî Tirkiyeyê xwest ku yekser ji başûrê Kurdistanê vekişe. DYA digel hemû hewlên xwe di warê diplomatîk de biserneketî xuya dike. Ji ber ku DYA'yê piştigiriya dewletên mezin yê wekî Çîn, Rusya û Fransa wernegirtiye. Tê gotin ku DYA dixwaze vî tevgera leşkerî, hêza xwe ya leşkerî bi gelên herêmê bide pejirandin û Iraqê bike warê ceribandina çekên xwe yê bi teknolojiya nû.

Çapemeniya tirk baş dixebite

Di bûyerê bi vî rengî de çapemenî xwe winda dike. Heta niha şer ji manşetên rojnameyê tirk daneketiye. Ev yek nîşan dide ku şer, bi Tirkiyeyê her tişt dide jibîrkirin. Li aliyekî eflasyon zêde dibê, karker jî kar tînin avêtin, insan bi pey gezek nan ketine. Lê çapemeniya tirk van yekan nabîne. Li gorî agahiyan ev bûyer li Amerikayê ne nûçeya sereke ye. Doç. Dr. Fikret Başkaya diyar dike ku sê sedemên vî êrîşê hene; ev hêza hegamonîk qehremaniya xwe nîşanî dinyayê dide; di sistemên împeryalîstan de şer bi riya çapemeniyê tene meşandin. Başkaya diyar dike rayedarên Amerikayê dixwazin bi van êrîşan biryara butçeyê zêdetir ji bo şer jî Senatoyê derxin. Mamosta Başakaya li ser rewşa kurdan radiweste û diyar dike ku kambaxiya rewşa kurdan ji ber nebûna yekîtiya wan e. Piştî re ew dibêje: "Ez bi avakirina dewleteke kurd ne ba-



wer im. Lewra rewşa vî gavê tam li gorî berjewendiyên DYA'yê ye." Başkaya diyar dike ku tiştêkî ku kurd bikin heye; divê hemû kurd di eniyeke anti-împeryalîst te bigihîjin hev. Li gorî Başkaya, heke Iraq parçe bibi, dê başûr bibe wê Başûr bibe navenda pisgirêkan.

Li ser rewşa şer ya li Iraqê Şewirmendê MÎT'ê yê berê Mahir Kaynak diyar dike ku hedefa vî êrîşê rasterast hêza leşkerî ya Saddam e. Kaynak diyar dike dema ew êrîş Saddam bêtêz bikin, wê zordestiya wî ya li ser kurdan jî rasterast kêr bike. Kaynak diyar dike ku heger yekîneyên kurdan û dewleta tirk li hev bixin, dibe ku ev êrîş rengê dagirkeriyê bistîne. Kaynak diyar dike ku li Başûr avakirina dewleteke kurd niha ne gengaz e, heger ava jî bibe ew nikare demeke dirêj bijî. Li gorî Kaynak, dewleteke nêzî herêmê wê dewleta kurd bipelîşîne. Wî da zanîn ku di avakirina dewletekê de, divê alîkariya dewleteke mezin a nêzî herêmê hebe. Her wiha Kaynak diyar dike ku dewleta tirkmenan tiştêkî çewt e, ew komikeke biçûk in. Wî got: "Heger komarek çêbibe ew jî wê komara kurdan ya li Iraqê be, tirkmen jî dê di nava wê hindikahiyek be. Divê tirk jî bo ku bi kurdan re şer bikin nekevin herêmê. Tirkiye divê avabûna hin tiştan baş bibin, ew tişt ne tiştên xetere ne ji bo wê." Prof. Kaynak piştî re jî ew nixandina serincrakêş kir: "Ji ber gelemşeya niha wê CHP jî hikûmetê piştigiriya xwe bikişîne. Dibe ku Hikûmetêke bê Ecevit bê avakirin."

AZAD ALTUN

Kurtenûçe

Roja 11'ê reşemiyê, li kûçeya Yasemîn a navçeya Fatîha Stenbolê, 2 kes ji hêla polîsan ve hatin înfazkirin. Hate îdfakirin ku jin û zilamê ku hatine kuştin PKK'yî bûne û di navbera wan û polîsan de şer derketiye. Lê li gorî şênîya taxê, di bûyerê de pevçûn çêbûye û polîsan înfazêke bêdarizandin pêk aniye. Hate ragihandin ku 2 kes li mala Seyfêdîn-Emîne ku ji Mêrdînê ne, ji nav 15 kesan hatine hilbijartin û înfazkirin.

Rûsa daxwaz kir ku, Tirkiye baregehên xwe ji bo Amerikayê nade bikaranîn. Roja 11'ê reşemiyê li Enqereyê balyozê Rusyayê Vatim Kuznetsov daxuyaniyek da AFP'yê û got ku em hêvîdar in ku dewleta tirk, bêtî ku biryara neteweyên yekbûyî êşkere bibe, baregeha Încîrlîkê ji bo berjewendiyên Amerikayê bi kar neyîne. Wekî tê zanîn berê jî Serokdewletê Rusyayê Borîs Yeltsîn daxuyaniyên tund li dijî tevgera Amerikayê dabûn.

Gerava birçibûnê ya li Girtîgeha Giresûnê, ku girtiyên PKK'yî dabûn destpêkirin kete roja xwe ya 39'yan. Hate ragihandin ku rewşa 10 girtiyên gelek xedar e û ji mîde û avrêja wan xwîn tê. Her wiha heman girtî xwîn diavêjin, diverêşin û êdî nema baş dibînin. Li aliyê din jî bo ku problemên girtiyên bî çareserkerin, Serokê Giştî yê THYD-DER'ê Medenî Ayhan serî li berpirsiyariya giştî ya girtîgehan da lê tu encam jî vî hewlê nehate wergirtin.

Parlamentêrê Partiya Sosyal Demokrat a Almaniyayê (SPD) Barbel Narnhammer û ji koma alîkariya ji bo rojnamegeran, ku ji rojnamegeran pêk tên; Goodgried Stein xwestin ku rojnamegerê Özgür Gündemê, ku niha li Girtîgeha Aydinê girtiye Hasan Özgün ziyaret bikin, lê ev daxwaza wan ji hêla Wezaretê Dadê ve nehate pejirandin. Parêzerê Özgün Av. Türkan Aslan diyar kir ku, tevî heyeta ku xwestiye hevditin pêk bîne li Ewropa û cihanê gelek derdorên demokratîk dixwazin alîkariya Hasan Özgün bikin.

Bi zimanê mêtîngeran, civaka azad nayê afirandin

Di vê beşa pirtûka navborî ya li ser pirtûkê de tiştê balê dikişîne, ew e ku nezanîna zimanê kurdî, li ber xebata hûr û kûrtir bûye asteng. Di vê beşê de bilêvnekirina navê rojname û kovarên bi kurdî ku piştî şoreşê dest bi weşanê kirin, wekî kêmasiyekê xuya dike.

SAMÎ BERBANG

Têkoşîna azadiyê ya gelê kurd, têkoşîneke pir-alî ye; têkoşîn bi alavên têvel û di warên cur bi cur de tê meşandin. Ew war giş têkildarî hev in, yek bêtî ya din nabe, dema aliyek qels û lawaz bimîne, aliyê din jî li gorî daxwazê bi pêş nakeve. Lewre heke tevger bi xwe mîna hûtek be, ew war jî her yek lingekî hût in. Dema lingek lawaz be, tevger leng û kulek dimîne.

Mamoste İsmail Beşikçi jî di pirtûka xwe ya dawîn "Hayali Kürdistan'ın Dirilişi (Vejîna Kürdistana Xeyalî)" de balê dikişîne ser vê rastiyê. Di pirtûka navborî de, ji bo me beşa herî girîng beşa li ser zimên. Di vê beşa bi navê "Gerilla Mücadelesi ve Kürt Dili (Têkoşîna gerilla û zimanê kurdî)" de li ser girîngiya bikaranîna zimanê kurdî radiweste. Ev beş bi tesbîtekê dest pê dike: "Têkoşîna gerilla heyecana ku di warê siyasî û civakî de pêk aniye, di warê zimên de pêk neaniye." Piştî re jî tê gotin ku ziman taybetiya sereke ya her neteweyê ye.

Ziman gencîneya hest û ramanên gelan e

Her wekî ku gelek caran di nav rûpelên Azadiya Welat de ji aliyê gelek kesan ve jî hatibû gotin, mamoste Beşikçi jî dibêje: "Ziman bi tenê hacetê ragihandinê nîn e, ziman di heman katê de gencîneya ye ku ezmûn, raman û agahiyên gelan ên ku bi salan wan gihandine hev û jî nifşên berê derbasî nifşên nû bûne." Bi van gotinan jî, baweriya hinek hevalan a li ser zimanê kurdî pûç derdikeve, lewre li gorî van hevalan, "ziman ne armanc e, bi tenê hacet e, nexwe heke mirov bi kîjan zimanî baş dizane, divê mirov bi wî zimanî bipeyive û binivîse." Her wekî mamoste Beşikçi jî destnîşan dike, dijmîn bir û ramanên xwe, bi alîkariya zimanê xwe dixê serê me, dema ku kurd guh nedin zimanê dijmin wê demê, ew dê bêgav bimîne ku propagandaya xwe bi zimanê kurdî bike, dema yek bi kurdî bibêje, zimanê kurdî nîn e, kurd tune ne, dê bikeve nava rewşeke seyr û pêkenokî, kes baweriya xwe pê nayîne. Ev yek jî wê propagandaya dijmin bêbandor bihêle.

Di nava nivîsê de mamoste Beşikçi serpêhatiyekê xwe daye, li gorî vê serpêhatiyê hinek xebatkarên NÇM'ê çûne Başûr, piştî demekê, dema vegeftine, li ser Başûr ev nirxandin kirine: "Rast e, hemû tişt bi kurdî ye, lê evîna welat û gel, hestên neteweyî qels in li ba gelê

Başûr, li Bakur hestên neteweyî berztir in." Bi vê yekê jî xwestine bidin xuyakirin ku ziman bi tenê ne pîvana welatparêziyê ye. Heman dîtin jî aliyê hin hevalên din ve jî tîr parastin û wekî argûman tîr ber mirov. Heta mirov dikare bibêje ku demeke dirêj, karê çand û zimên wekî karê reformîstan hatiye dîtin û kesên bi van karan daketine, wekî reformîst hatine binavkirin, lê ew dîtin jî ne cihê xwe de, lewre ziman û çand malê civakê ye, hest û raman, bir û baweriyê gel di nava çanda gel de veşartî ne û bi riya zimên derdikevin holê. Kesekî ku bi zimanê gel nizanibe, hest û ramanên gel jî nêzîk ve nas neke, nikare ji bo gelê xwe têkoşîneke ji dil bide û bibe mîlîtanekî têkoşîna gelê xwe jî.

Li aliyê din divê cudatiya Başûr û Bakur, baş bê zanîn; li Bakur digel hebûna gel, zimanê wî jî hatiye înkarkirin, ji bo ku gelê kurd hebûna xwe bi mêtîngeran bide pejirandin, divê zimanê xwe jî bide pejirandin. Lê li Başûr hebûn û zimanê kurdî tu car nehatiye qedexekirin, her tim kurdî bûye zimanê perwerdehî û ragihandinê, rewşenbîrên kurd hemû xebatên xwe bi kurdî kirine, lewre jî tîkiliya di navbera zimên û mafên neteweyî de ne ew qas xurt e. Li aliyê din sersariya hinek mirovên başûrî li hemberî doza neteweyî, girêdayî gelek hoy û sedemên dîtin in. İro bi têkoşîna azadîxwaz ew rewş gelekî guheriye, têkoşîna ku li Başûr li dijî hêzên dagirker tê dayîn bi giranî jî hêla gerilayên ku ji Başûr ketine nav refan ve tê dayîn. Her wiha li welêt û li derveyî welêt, tevgera azadîxwaz, ji rewşenbîrên kurdên ên başûrî û Sovyeta berê sîdê werdigire. Ew kes jî geşbûna rewşenbîriya kurdî re dibin alîkar.

Divê li dadgehên em bi zimanê xwe bipeyivin

Mamoste Beşikçi di vê nivîsê de şaş û metelbûna xwe di warê sersariya li hemberî zimanê kurdî diyar dike û dibêje: "Heta ku ew guhnedana zimanê kurdî û ew helwesta li pêş girtina zimanê mêtîngeran bidome, nûjenbûn di cih de pêk nayê." Her wiha heta em zimanê dagirkeran bi kar binin, her çiqas em hukmê saziyên wan li ser xwe nepejirînin jî, wê tîkiliyek di navbera me de her hebe. Ji bo vê yekê jî mamoste, helwesta dilên azadiyê ya li hemberî dadgehên dewleta tirk wekî mînak dide. Mamoste dibêje, dema girtî bi zimanê tirkî bibêjin, em dadgehên dijminan nas nakin, bi temamî nikarin peywendiyên xwe bi rejîmê re bibirin, wê dozger û dadger, kesên ku digel peyivîn fêm bike û ji xwe bibîne, lê vê

yekê bi zimanê kurdî bikin, ew jî tê bigihêjin ku hinek biyan, bi zimanekî biyan li pêşberî wan dipeyivin. Dîsa mamoste Beşikçi dibêje, ji ber vê yekê mêtînger bi her awayî xebatê dikin ku rê li ber geşbûn û fermibûna zimanê kurdî bigirin. Bi rastî jî di dema darizandina xebatkarên Welat de ev yek bi awayekî zelal dihat dîtin. Her çiqas wan nedigot ku em dadgeha we nas nakin jî, dadger û dozger jî ber ku ji zimanê kurdî fêm nedikirin, bi çavê dijmin li wan dinêrî û rûyê xwe yê rastîn didan der, rûpûşiya xwe ya bêlayaniyê diavêtin aliyekî û bi rûyê xwe rastîn derdiketin holê. Lewre jî gef li xebatkarên rojnameyên bi kurdî dixwarin.

Her wiha rewşa pêkenokî ku ew ketibûnê jî hêjayî dîtinê bû. Li aliyekî jî ber nivîsên bi kurdî doz hatibû vekirin, li aliyê din dema kesên ku dihatin darizandin bi kurdî dipeyivîn, digotin: "Bersûc: bi zimanekî ku jê nayê fêmkirin dipeyive." Ma jî vê komîktir rewş heye?

Divê em bersivê bidin êrîşên li ser zimanê xwe

Nakokiyekê rewşenbîrên kurdan ku bala İsmail Beşikçi kişandiye jî, bêdengiya li hemberî êrîş û heqaretên li ser zimanê kurdî ye. Ew dide xuyakirin ku berdevkên bîrdoza fermî zimanê kurdî biçûk dibînin, êrîşên tund dibin ser, lê rewşenbîrên kurd li hemberî vê yekê dengê xwe nakin. Mamoste Beşikçi piştî ku vê helwestê rexne dike, dide zanîn ku gotinên qelêmşorên dewleta tirk ên li ser kurdî ne rast in. Di dîmahîka nivîsê de bi serpêhatiyekê xwe, mamoste Beşikçi bersivê dide kesên ku dibêjin, du kurdên jî êşîrên cuda hev û din fêm nakin. Mamoste dibêje: "Min hê di salên 1960'î de bi çavên xwe dît ku leşkerekî qersî, pêşmergeyekî barzanî bi hêsanî fêm dike."

Xaleke balkêş ku di nivîsê de li ser hatiye rawestî jî, nirxandina li ser peyva "türkü" ye. Mamosta İsmail Beşikçi dide zanîn ku gelek kes peyvên "stran û kilam" wekî "türkü" werdigerînin, ew jî bandora bîrdoza fermî li ser kesên navborî nîşan dide, lewre ew peyv tenê ji bo stranên bi tirkî divê bê bikaranîn, li aliyê din peyvên "şarki" jî bo tiştên ku malê şerqê (rojhilat) nîşan dide û peyva "ezgi" guncawtir e ji bo wergera stran û kilamê. Xuya ye ku bandora bîrdoza fermî bi vê yekê tenê ne sînor kiriye, gelek mînakên din jî hene, ji gelek mirov siyasî bipirsi bibêje, çiyayê herî bilind ê Tirkîyeyê kîjan e? Ew dê jixweber bibêje: "Ağrı".

Di nivîsê de tê gotin ku hewla afirandina mirovê nû, civaka nû bi zimanê ser-



destan, hewleke li dijî qanûnên siruştî ye. Digel vê yekê helwesta hinek kesên ku xebata bi zimanê kurdî wekî nîjadperestî û neteweperestî bi nav dikin jî hatiye rexnekirin.

Têkoşîna ji bo serdestkirina zimanê kurdî didome

Di vê beşa pirtûka navborî ya li ser pirtûkê de tiştê balê dikişîne, ew e ku nezanîna zimanê kurdî, li ber xebata hûr û kûrtir bûye asteng. Bo nimûne mamoste Beşikçi nekariye li ser rola weşanê bi kurdî tu nirxandinê bike, di vê beşê de bi lêvnekirina navê rojname û kovarên bi kurdî ku piştî şoreşê dest bi weşanê kirin, wekî kêmasiyekê xuya dike. Lewre heke serpêhatiya xebatkarên Welat û Welatê Me yên li dadgehên, nivîsên ku di vê rojnameyê de derketine bixwenda, wê hê kûrtir li mijarê bikole. Her wiha diviyabû mamoste rola MED-TV ya di vî warî de jî ji bir nekira.

Li aliyê din, tevî ku di vî warî de yên herî zehf renc û zahmetiyê dikşînin em xebatkarên çapemeniya kurd in jî, em bi qasî mamoste bi bedbînî li mijarê nanêrin. Lewre her çiqas gavên di warê geşkirina zimanê kurdî de hatine avêtin dîrî daxwazê bin jî, hinek gav hatine avêtin. di vî warî de jî têkoşîna bîrdozî di nava kadroyên tevgerê bi xwe de jî bi tundî didome û giraniya kesên ku bikaranîna zimanê kurdî dixwazin zêdetir dibe. Xuya ye ku têkoşîna di vî warî de dê demeke dirêj bikişîne, lê di dawiyê de dê rastiya ku mamoste Beşikçi anî zimên, di serê her kesê welatparêz û azadîxwaz de zelal û sayî bibe.

Di dawiyê de divê bê gotin ku ew dîtinên mamoste Beşikçi hêz da me xebatkarên çapemeniya azad a ku bi zimanê zikmakî xebatê dikin, ji bo vê yekê jî em spasî û silavên xwe ji mamosteyê hêja re pêşkêş dikin.

Bavê Nazê, di "Rêzimana Zimanê Kurdî" de çawa tê dîtin?!

DEHAM EBDILFETTAH

(Dûmahika hefteya berî vê ye)

Lê raweyên daxwaziyê (telebî), bi van şewazan pêk tên: "Fermanî, bilanî, xwezîni, gerekî, mercî". Gelek ji van raweyan wekî hev tên. Û li gorî wateya hevokê, nav li raweyê dibe. Ji bilî raweya fermanî (bike, bikin), hemû raweyên dîtir, li gorî dema 'nuho' û 'buhêrkê', pêk tên.

Nimûne: "Raweya xwezîni"

1-Bi dema 'nuhokê re:

- Ew dixwîne, xwezî, em jî bixwînin.

2-Bi dema buhêrkê re:

a-Wî xwend, xwezî me jî bixwenda.

b-Wî xwendîye, xwezî me jî xwendî-

be

c-Wî dixwend, xwezî me jî xwendî-

ba

ç-Wî xwendibû, xwezî me jî xwendî-

bûya.

Her wisan raweyên dîtir ji bi vî şewazî tên veguheztin. Tenê, raweya 'mercî' bi dû lêkeran 'sermerc' û 'bermerc' wateya xwe sergihayî dibe.

Bavê Nazê, du raweyên xweste daxwaziyê tenê bi kar anîne.

1-Di rûpela 93'yan de, bi sernavê 'Wexta bihûrî ya hoyî'. Nimûne:

- Mîne bidîta (Mîne dê bidîta)

- Mîne bidîta (me dê bidîta)

- Mîne bidîta (me dê bidîta)

2-Di rûpela 99'an de bi sernavê "De-

ma pêş ya hoyî". Nimûne:

- Mîne dîtibe

- Mîne dîtibe

- Mîne dîtibe

Di rûpelê 119'an de Bavê Nazê darsa xwe bi navnîşana "Hevoka navdêrî" rave dike û van mînanan jê re dike nimûne:

"Dara sêvê, Keça spehî, Pirtûka min.

Bavê Nazê, di ravekirina hevoka navdêrî de dibêje: "Hevoka navdêrî bi serê xwe nayê" û di rûpele 11'an de jî, hevokê dide nasîn: "Hevok bêjeyek e, yan jî çend bêje ne ku fikra temambûyî nîşan dide."

Li gorî pênasiyê hevokê û li gorî ku Bavê Nazê jî wê dide nasîn; ev hevoka "navdêrî" yî ya ku Bavê Nazê ew mînakên çûyî, jê re kirine nimûne... ew bi xwe ne hevok e. Bavê Nazê, xwe bi xwe, dikeve hevdişîtiya gotinê, carekê dibêje: "Hevoka navdêrî, serbixwe nayê" û carekê jî dibêje: "Hevok fikra temambûyî nîşan dide." Û "Dara sêvê", ne hevoka sergihayî ye. Lê Bavê Nazê, wê dike, hevoka navdêrî?!

Di warê rênivîsê de jî, hindêk têbînîyên me li ser rêzanên (qaîde) rastnivîsa Bavê Nazê hene:

1-Di rûpela 93'yan de, Bavê Nazê van herdû alavên (emraz) duwarojê (paşeroj, ayinde): "ê, dê" ne wekî hev dinivîse. Bavê Nazê "ê"yê bi cînavan ve dinivîse, û "dê" yê ji cînavan cuda dinivîse:

- Mîne bidîta (mîne dê bidîta)

- Teyê bidîta (te dê bidîta)

Her du alav, bi yek karî radibin; û herdu jî bi yek wateyê tên. Çima Bavê Nazê wekhevîyê, di navbera wan de na-ke?!

Tevî ku bilêvkirina her du alavan bi cînavan re, ne wekî hev, sivik e jî, lê pêwîst e, her du, dûrî cînav û navdêran bêne nivîsin:

- Mîne bidîta

- Mîne dê bidîta.

2-Di rûpelê 153'yan de û di bin sernavê "Rastnivîsîna lêkerên heyin û hebûnê" de, Bavê Nazê, bi kurtî dibêje, heger navdêr, rengdêr û pronav bi dengdarekê dûmahî bibin, gereke lêkerê "heyin" û "bûyin" ê bi wan ve bêne nivîsin. Wek nimûne:

'Ez kurdim',

'Ew base',

'Ên qenc hûnin',

Lê ku navdêr, rengdêr û pronav bi dengdarekê dûmahî bibin, hingê lêkerên "heyin, bûyin" ê cuda tene nivîsin. Wek nimûne:

'Ez Mamoste me',

'Ew spehî ye',

'Ev xwişkên me ne'.

a-Bavê Nazê ev rêzanê rastnivîsîne, li ser bingeha bilêvkirina fonîfîkî, ava kiriye, ne li ser bingehe morfolojiya bêjeyan. Ev jî tişteki awarte ye. Ne durist e, ku me (bo giraniya bilêvkirîne) bêjeya ku cuda tê nivîsin, bi peyvan ve

binivîsin e.

b-Diyar e, ku tu têvelî, di navbera "heyin" û "bûyin" ê de, li nik Bavê Nazê nîn e. Bavê Nazê bo her du lêkeran jî, yek mînakê tene:

'Ez mamoste me',

'Ew spehî ye.'

Vêca, pirs ev e: Ma ev "im, î, e, in" lêkera "heyinê ne yan jî ya bûyin" ne?!

c-Bavê Nazê pê de diçe û dibêje: Heger navdêr, rengdêr û pronav bi çi tîpê dûmahî bibin jî, gerek lêkera "hebûn" ê jî wan cuda bêne nivîsin. Û van nimûneyan dide:

- Ez kurd bûm

- Ew mamoste ye

- Ew xwişkên me bûn.


Ev rastnivîsîn, durist e. Lê, hevberkirina Bavê Nazê, ku lêkerên "heyin" û "bûyin" ê, dane ber lêkera "hebûn" ê û ew beranberî hev kirine; ev ne rast û durist e. Ji ber ku Bavê Nazê, lêkerên "heyin" û "bûyin" ê di dema 'nuhokê', di dema "buhêrkê" ê de bi kar anîne. Ev jî, rastiya hevberkirina mînanan, pêşçav nake.

Li dûmahîya vê gotarê, dîsan ez dibînim: Pirtûka Seydayê hêja, Bavê Nazê, tev li van têbînîyên me jî, hêj pirtûkeke girîng û nirxdar e.

*Di kurmanciya jêrin de, li şûna 'zarava', şewezar dixebitînin û 'zarava' bi wateya 'term' bi karînin. Û ji ber ku 'şewezar' bi wateya, hawayî tê, me 'şewezar' li şûna 'zarav' danîye. *Navên deman li nik rêzimanzanan tên guherîn.

Ayîneke Pîroz

HASAN KAYA



Gelo tu çaran lêzimên we hatine wînda kirin? Heke ez bi aweyekî din bibêjim, gelo agir bi kezaba we jî ketiye? Heke bersiva we neyîni be, divê ku hûn bikevine "rewşa ji-xweçûnê". Cureyekî teatêr heye. Jê re dibêjin "trans".

Mirovê ku rolê xwe pêk tîne, xwe dike şûna mirovê ku jiyana wî an jî wê tê ser sahnê. Ji ber wê yekê şanoger kûr û dûr difikire. Dibêje gelo mirovê ku ez niha jiyana wî vedijînim, çawa hêrs dibû, çawa reaksiyon nîşan dida. Nêrînên wî yên der barê cinsiyetê de çawa bûn. Dema ku bela dihat serê wî, çi dikete hişê wî.

Dawiya van pirsan nayê. Her ku diçe zêde dibin. Li gorî vê bêşa teatrayê, şanogerek çiqas van pirsan zêde bike û bersivê di pratîkê de pêk bîne, ew qasî jêhatî û bi serketî tê pejrandin.

Li Stenbolê dema ku saetê nêzîkî diwanzdehan dayik û lêzimên ku ava kizabê bi ser kezaba wan de hatiye rijandin, kul û keserên xwe di paşila xwe de vedîşerî û berê xwe didine tenişta Lîseyê Galatasarayê. Dema ku saet dibe diwanzdeh êdî "ayîneke pîroz" a ku di tu olan de nehatiye dîtîn, dest pê dike. Rûyên mirovên ku beşdarî vê ayîne dibin, bêtir ji rûyê dayikan, şeweyekî erjeng werdigire.

Heke hûn li Stenbolê dijîn, an jî hûn li vir nejin lê rîya wê pê bikeve, emanet xwe jî ve "ayîna pîroz" bêpar nehêlin. Heke rîya we bi Stenbolê nekeve jî, hûn rîya xwe pê bixin û carekê tevî wê ayîne bibin. Hûnê bibînin ku ji ber xwe ve, gotinên wekî helbestan ji nav dilê we herikîn ber bi lîvên we. Wê demê hûn amade ne ji bo rewşa "ji xwe çûnê".

Ji kerema xwe hinekî xwe têxin şûna wê dayika li kêleka xwe. Ya ku wêneyê lawikê wê di destê wê de ye û wekî peykerekî rawestiyaye.

Gava din yekê ji wan gotibû, xwezî kurê min êvarekê xwe bida devê derî, bila ez wê gavê biketema û bimirim. Gelo janên ku mirov mecbûrî mirinê dikin çawa nin?

Ji kerema xwe hêjmarê van pirsan zêde bikin. Mesele, dema ku dayik çav li firçeya rihê kirinê ya lawê xwe dike, dilnîyêk çawa pê re çêdibe? Dema ku dayik sibeha cejnê ji xew radibe, dema ku çav li hevalê kurê xwe dike û hêstir ji xweber bi ser hinariyên rûyê wê de berdidin, çi tofan di nav kanika dilê wê de radibe?

Ez her tim difikirim, gelo ev kesên ku em ji wan re dibêjin: "Wînda" di nav tenahiyeke çawa de ne. Li kîjan bajarê mirinê rûdin. Ji wan û wê de gund hene gelo? Miriyên di nav goristanan de xwedî cîran in. Qenc, xerab li der û dora xwe hinek mirovan dibînin. Lê li gundê windahiyan hew yek mirov rûdine her dem bi tena serê xwe. Gabriel Marquez romanek nivîsibû. Navê wê bi tenahiya serdsalî ye... Mirovê "wînda" ev roman xwendibû gelo...?

Ez pêşniyara xwe dubare dikim: Carekê be jî beşdarî vê "ayîna pîroz" bibin û bikevin "halê ji xwe çûnê". Dibe ku pirs û bersivên we nebin. Wê demê jî welatê xwe û zarokatiya xwe bînin bîra xwe û heta ji wê tê van bajarên xerfîyê ji bir bikin.

Şoreş, bêjînga çîn û gelan e

Şoreş, pêvajoyên ezmûnkirina gelan in. Rewş û şexsiyeta hemû çîn û mirovan derdixin holê û didin naskirin.

Îro gelê kurd jî di pêvajoya vê ezmûna mezin û dîrokî re derbas dibe. Hemû çîn û mirovên kurd li bêjînga şoreş û dîrokê dikevin; mirovên ku hêz û biryara jiyane di wan de heye, tên bijartin û veqetandin. Ev mirov, ji bo gelê me dibin tovê jiyane û xezîneya me ya neteweyî bi wan dewlemend dibe. Lewre, mirovên wiha, bi dil û can û mal ji bo doza gel û welat xwe amade dikin; nixrên mirovane û neteweyî diafirînin; ji bo rizgariya neteweyî xwîn û xwêdana xwe bê şert û merc dirijînin. Ev mirov, ji dozê, ji şoreşê naxwin, lê tim ji xwe didin dozê. Mirovên wiha, ne li pey nav û deng an jî dewlemendiya aborî ne; ew, dewlemendên evîn û rûmetê û yên giramî û şerefê ne. Ew, canfida û xizmetkarê gel û welat in. Ew in, yên ku destanên gernasiyê ji bo gel diafirînin û çerxa dîrokê bi lez digerin; ew in, mirovên ku dibin giyan ji bo gelan û jî bo şoreşan. Gelek ji wan, gernasên bênav in. Ew in, yên ku li dijî dijmin di rojên reş û şerê xedar de singa xwe ji bo gel û welat dikin çeper û wekî pilingan ji sîperan dipekin û êrîşî ser dijmin û mirinê dikin....

Netewe û çînen ku nixr û qedera xwe bixe destê lawên xwe yên wiha bijarte, tu car bîndest nabe û piştta wan nayê erdê, her tim azad û serfiraz dimînin. Mirovên wiha, serê neteweya xwe her dem bilind dikin. Xwezî bi van mirovan,

Belê, bêjînga ezmûna şoreşê bi domdarî dixebite; mirovên wekî yên jor, ku li gor rêz û zagonên şoreşê xwe saz kirine binbêjîng nabin. Lê mirovên ku wiha xwe saz nekirine binbêjîng dibin.

Emê hinekî li ser van mirovên binbêjîng bisekinin. Baş e, kî e ev mirovên binbêjîng?

Ev mirov jî di nav refê şoreşê de ne, lê belê pirtir ji bo berjewendiyên şexs û malbata xwe dixebitin. Li ser xwîn û xwêdana şoreşê jiyana xwe belaş didomînin. Nixr û keda gelê me dixwin. Ev mirov, li pey nav û dengê xwe digerin, li ser nixrên şoreşê û xwîna şehîdên me fortê dikin. Çavbirçî û keysperest in, çavê wan her tim li dewlemendiya aborî ye. Dema keysê dibînin, bi rihetî nixrên şoreşê dixwin û bi wan dilîzin. Gotina van mirovan mezin û zimanê wan pir dirêj e, ji fêl û fenan re jêhatî ne, lê ked û xebata wan pir biçûk e. Ji fedakariyê dîrevin, nêzikî karên bi talûkê nabin. Jiyana xwe ji bo tiştên şexsî û rojane saz kiri-



ne. Ji bo rojêke paşayane tiştêkî ku feda nekin tune ye. Lîngêkî wan di nav refên şoreşê de ye û yek jî di nav refên sazûmana mêtînger de ye. Xwe ne ji dêrê û ne jî ji mizgeftê dikin; di nav her du refan de jî li berjewendiyên şexs û malbata xwe digerin. Dema pêla şoreşê bilind dibe, şoreşgerên ji wan jêhatî û şareza tune ne. Lê ku şoreş hinekî li paş dimîne dîrevin cem dijmin.

Belê ev mirov, vî qarektêr û rûyê xwe di bin perdeya welatparêziyê de vedîşêrin û gelê me dixapînin. Lewma, pêwîst e gelê me li dijî van mirovan hinekî hişyar be, perdeya rûyê wan deyne xwarê û li nixrên şoreşê, li xwîn û xwêdana wê baş xwedî derkeve. Divê welatparêzên ji dil û can xwe bidin pêş û meydanê ji van mirovên xweperest re nehêlin. Di nav sazgehên me de cihgirtin ewqas ne tiştêkî hêsan û erzan e. Divê mirovên binbêjîng fêrî vê yekê bînin kirin. Pêwîst e ev mirov bizanibin ku nikarin wisa bi rihetî, bi nixrên têkoşîna me bilîzin. Ji her awayî ve divê ev mirov werin naskirin. Lewre, pivanên exlaq û nixrên şoreşa me dilewîtin; ji bo yekîti, rêxistin û perwerdeya gelê me tu xebateke bikêrhatî nakin, ji bo gel û têkoşîna mistek keda wan tune ye, tu zor, zehmetî û fedakariya mezin nadin ber çavên xwe, pir erzan nêzî wezîfeyên şoreşê dibin û pêwîstiyên şoreşgeriyê bi cih neynin. Lê belê, ji gel her fedakariyê dixwazin. Ev helwesta van mirovan, refên têkoşîna û sazgehên me yên bêpa-

yan dilewîtin; bîr û baweriya gelê me dişîne, ji têkoşîna dîr dixê, bi girêdan û hestên wî diêşînin, li dijî têkoşîna bi gel re dikevin rik û xîsmê, bi vê helwesta xwe wan dişînin cem dijmin, refên dijmin xurt dikin. Pêwîst e ev mirov jî bizanibin ku bi vî awayî xizmetê ji dijmin re dikin. Lewre xebata wan û ya kontrayên dijmin pir nêzikî hev e. Carinan xisara ku deh kontra nikarin bidin têkoşîna me, mirovekî/e binbêjîng bi rihetî û li ser navê welatparêzî û şoreşgeriyê dide. Heger ku hinek welatparêzî û ji bo gel û têkoşîna hinek evîn bi van mirovan re hebe, pêwîst e di demeke kin de li ser xwe bisekinin, xwe serast bikin. Bi duristî û xebateke wiha ew jî dikarin bibin xwedî xebateke bi giramî û rûmet. Binbêjîngî di dema îro de, ji bo her mirovê kurd şerm e, pêwîst e yek mirovê me vê rewşê layîqî xwe nebîne.

Lê mixabin, hîn pirtir jî li metropolan mirovên ku binbêjîngiyê layîqî xwe dibînin pir in. Îro ji van mirovan di nav sazgehên me de pir hene. Heger ku ev sazgehên me xebata xwe li gor zagon, pîvan û rêzên têkoşîna û welatparêziyê û li gorî xet û fermanên tevgera azadiyê bimeşînin, wê ev binbêjîng zû werin naskirin û derkevin holê. Wekî zadê pîç wê zû bi ser avê bikevin û bi rihetî wê werin neqandin.

Belê, pêwîst e, ev werin kirin. Lê belê ev bi tenê ne bes in; divê hemû sazgehên me, endam û xebatkarên wan bi domdarî xwe li bêjîngê bixin,

azîne û rewşa xwe her roj di ber çavan re derbas bikin. Divê bi domdarî şexs û xebata xwe ji binbêjîngiyê paqij bikin. Doza ku tê meşandin dozê mezin û bilind e, divê mirovên ku di nav refê wê û sazgehên wê de ne jî bi ked û xebat û fidakariya xwe bigihêjin vî mezinatî û bilindiyê. Tevgera Azadiyê her gav bi pêş ve diçe, fireh û mezin dibe; wezîfeyên wê jî pir û giran dibin. Heger ku mirov gaven xwe li gor yên têkoşîna azadiyê xurt û bi lez navêje, mirov li paş dimîne. Çiqas mirov li paş bimîne, ew qas jî di pêşîya têkoşîna de dibe asteng û dawiyê mirov jî dikeve bin bêjîngê.

Halbûkî ji sazgehên me û endamên wan hêviya gelê me heye; ev, hêviya serkeftin û rizgariyê, hêviya fedakarî û gernasiyê ye. Lewma, pêwîst e ew bersiveke baş, bi nefsbîçûkî û xizmetkariyê mezin bidin gelê xwe. Heger ku partî û sazgehên dijmin bi qasî gaweke dixebitin, pêwîst e partî û sazgehên me bi qasî sed gavan bixebitin û hezar carî ji wan pirtir ji bo serkeftinê serê xwe biêşînin û fedakariyê bikin. Gelê me layîqî xizmeteke wisa ye û kî xizmetê ji gelê kurd re bike, ew ê jî bersiveke li gorî dilê xwe ji gel bigire. Binbêjîngî, şexsiyeta û wesfê dijmin e, ne layîqî welatparêzên kurd e. Şexsiyeta dijmin û ya welatparêz bi hev re najîn û li hev nakin, yek yê din dikuje û ji holê radike.

□ 18 reşemî 1993:

Kemal Kılıç hate kuştin

Nûnerê rojnameya Özgür Gündemê ê Rihayê û nûçegihanê rojnameya Yemî Ülküyê Kemal Kılıç, li gundê Kuluncê ku girêdayî bajarê Rihayê ye, ji aliyê qontrayan ve hate kuştin. Hêzên dewletê cendekê Kemal Kılıç ji bo otopsiyê dibin Rihayê, dotira rojê jî cendekê Kemal Kılıç bi zorê ji destê malbat û hevalên wî direvînin. Dû re cenaze ji polîsan tê standin û li gund bi merasimeke berfireh tê binaxkirin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 20 reşemî 1909:

Amîd-î Sevda hate weşandin

Kovara Amîd-î Sevda, li Stenbolê di reşemîya 1909'an de hate weşandin. Kovara ku 6 hejmarên wî derketin, bi zimanê tirkî derdiket pêşberî xwendevanan. Kovar ji aliyê Alî Emiriye Diyarbekirî dihat derxistin û xwediyê wê jî Mehmet Şikriye Diyarbekirê bû. Li gorî hin çavkaniyan jî xwediyê kovarê Şukrî Amedî ye û wî di sala 1908'an de li Diyarbekirê bi navê Amîd rojnameyek derxistiye.

Pirsgirêkên şanoya kurdî hatin nîqaşkirin

Li ser "Şanogeriya kurdî" roja 9'ê reşemîya 98'an li NÇM'ya Îzmîrê ji Teatra Jiyana Nû Saniye Tunç, ji Şanoya Hêvî Yusuf Unay, ji Teatra Evîna Welat Hülya Nayir, û ji Teatra Yekbûn İdris Ertuş fikir û ramanên xwe anîn zimên.

Li Navenda Çanda Mezopotamya şaxê îzmîrê li ser "Şanogeriya kurdî" roja 9'ê reşemîya 1998'an panelek li dar xist. Ji bo panelê; ji Teatra Jiyana Nû Saniye Tunç, ji Şanoya Hêvî Yusuf Unay, ji Teatra Evîna Welat Hülya Nayir û ji Teatra Yekbûn İdris Ertuş li ser 'Şanogeriya kurdî' fikir û ramanên xwe anîn zimên. Beşdarên ku yekemîn car panelek vî rengî lidarxistibûn, nikaribûn encameke baş jê bistînin, lê dîsa jî li ser xalên girîng sekinin. Rêvebiriya bernamê Gerîndeyê Jiyana Rewşen Murat Batgî kir û beşdar bi giştî li ser pirsgirêkên şanogeriya kurdî, ziman û perwerdehî sekinîn û di vî warê de ramanên nêzî hev anîn zimên. Li hêla din beşdarên bernamê li ser pirsgirêkên şanoya kurdî, nivîsandina listikan rawestiyên û gotin em ji bo hemû pêşniyaran vekirî ne.

Xebatkarê Şanoya Hêvî Yusuf Unay, da xuyakirin ku, li cihanê şanogerî bi destpêka mirovahiye tê dest pê dîke û di vî warê de Unay diyar kir ku şanogeriya kurdî jî bi ayînên olî dest pê dîke û listikê gundan ê dîtbarî jî wekî mînak da. Piştî re jî wî da zanîn ku li ser listikên gundan, di vî warê dîtbarî de baş lêkolîn nehatiye kirin û ew nehatine nasîn. Unay, pêşketina şanogeriya kurdî jî bi şoreşê ve girêda û got: "Şoreşê tenê ne ji hêla şanogeriye, ji hêla çand û hunerê ve jî nixrên hêja afirandin. Lê dîsa jî ji bo şanogeriya kurdî ya bêpirsgirêk divê kurd azad bibin û ji hêla aborî û teknîkî tu pirsgirêk nemînin."

Xebatkarê Evîna Welat Hülya Nayir di axaftina xwe de diyar kir ku, ev hezar sal in ku gelê kurd li ser rûyê vî dinyayê dijî. Lê mixabin di hêla şanoyê de zanebûna kurdan kêmtir e û ew bi listikên Kosegellî, Baran Berda; Bûka Baranê û listika "Dayikî Niştîman" ku sala 1945'an li

Mahabadê hatiye pêşkeşkirin xwe sînor dikin, berde wama wan listikan çenebûye. Hülya Nayir da xuyakirin ku îro têkoşina neteweyî heye û dîsa jî şanogeriya kurdî bi pêş neketiye. Sedemên ve yekê jî tunebûna nasnameya gelê kurd, perçebûna Kurdistanê û tunebûna dewleta kurdan e. Ev pirsgirêk jî bo birêxistinbûn û rayedarîkirina şanogeriye dibe asteng.

Xebatkarê Teatra Jiyana Nû Saniye Tunç jî daxuyand ku birêxistinbûna şanogeriya kurdî bi şoreşê dest pê dîke û hêza bingeşê jî di wî warê de NÇM ye. Piştî re jî wê da zanîn ku pirsgirêka herî mezin a ku li pêşiya şanogeriya kurdî ye îro nivîsandina tekstê ye û ev peywir jî dikeve ser milên şanogeran. Saniye Tunçê gotina xwe wiha domand: "Gelên ku ji xak û dîroka xwe bêpar be, ne gengaz e ku di warê hunerê de bi pêş bikeve. Lê ev nayê vî maneyê ku em dev ji



vî karî berdînin."

Xebatkarê Teatra Yekbûn İdris Ertuş bi giştî li ser şanoya kurdî wiha got: "Li bakurê Kurdistanê xebatên şanoyê nû ne. Her wiha paşerojê xurt û nûjen di warê şanoyê de hate niha nehatiye dîtin. Pest û kotekiyên li ser şanoya kurdî jî xaleke girîng e. Divê bersivên pirsên bi rengê, 'pewîst e em şanoya kurdî bikin an jî bi kurdî şanoyê bikin?' bê dayîn. Şanoger baş bi kurdî nizanin. Listik bi kurdî be jî xebatên şanoyê bi tirkî çêdibe. Ev jî dibe sedema bipaşketina zimên."

Di dawiyê axaftinê de Ertuş got: "Em listikê xwe li derveyî NÇM'ê nikarin pêşkeş bikin. Divê em xwe bigihînin gel û pirsgirêkên di vî riyê de. Bê çareserîkirin." Bernamê nêzîkî 3 saetan domand.

A. WELAT/İZMİR

ÇAVDÊRÎ

Peykertiraşê Kurd Nezîr Xeylanî



MÎRHEM YÎGÎT

Hefteya buhurî (6/2/1998) peykertiraşê kurd Nezîr Xeylanî, tevî 48 peyker û hejmarek tabloyên xwe ji Norwêçê hate Stocholmê. Ew niha tevî artêşa xwe ya ji peyker û tabloyan pêk hatî, li Înstîtuya me bi cih bûye. Pêşangehê de du hefteyan berde wam bike û roja 23/2/1998'an bigihê dawîya xwe.

Navê pêşangeha Nezîr Xeylanî 'Azara kurdan' e. Ev nav her wiha navê peykerekî wî ye, ku wî bi xwe çêkeriye.

Nezîr Xeylanî jî başûrê welat e. Sala 1953'yan li bajarê Şeqlawe hatiye dinyayê. Di temenekî biçûk de, berî emrê wî têkeve 20'an hatiye girtin. Di zîndana navdar ya "Ebûxurêb" de li Bexdayê çar salan razaye.

Meseleya girtina wî jî hêjayî behskirinê ye: Nezîr, ji ber meseleyekê firar bûye. Polîsên dewletê lê digerin. Li vî alî û li aliyê din hinekî bi peran û hinekî jî bi riya dost û nasên xwe çend nasnameyan peyda dîke û lê dixê diçe Bexdayê. Rêjê mirovên dewletê pê dihesin û wî diavêjin zîndanê. Ji ber rojên di zîndanê de, bi ken wiha dibêje di sohbetên bi hevalan re: "Ez wekî mirovekî tewzîrkar ketim zîndanê û mîna siyasîyekî derketim. Di zîndanê de, ev tabloyên niha hûn dibînin û dê li Înstîtuya wê du hefteyan li dar bin, min beşek li zîndanê û yên mayî jî bi dû derketina xwe de çêkerin. Lê aliyê min ê xurt ne wênêkêşî, belê peykertiraşî ye. Jixwe piştî ez ji welat derketim min wêne nekêşan, bi tenê ez peykeran çêdikim."

Piştî derketina xwe ji zîndana Ebûxurêb, Nezîr salekê li çiyayên Kurdistanê pêşmergetiyê dîke. Sala 1987'an ji Kurdistanê Başûr derbasî Başûrê Biçûk dibe, li dora salekê li Sûriye dimîne. Di vî salê de, bi şanogere mîna Mêhdî Caf, wênêkêşê navdar Dara Aram re, ku niha li Kenedayê rûdinê hevalti û dostayetiya wî çêdibe. Ji sala 1998'an û vir de jî bûye penaber û li Norwêçê dijî.

Heta niha li Kurdistanê Başûr, li Iraqê, li Sûriye, li Norwêç û li Danîmerka bi dehan pêşangehên xwe li dar xistine. Ew endamê hejmarek rêxistinên navneteweyî yên hunermendî û pêşeyî û her wiha endamê Înstîtuya Kurdî ya Stocholmê ye.

Nezîr, mirovekî xweşsohbet e; xwedî helwest û deqarê ye. Ew gelekî hez ji henek û qerfan dîke: "Min xwendina xwe ya seretayî, ku giş 6 sal in, di 12-13 salan de qedand. Piştî mekteba seretayî jî min her sinîfekê dugîsinî û carna jî sêgîsinî dikir. Dema mamoste dersê dida, ez tiştên din difikirîm. Baş bû ku ez nebûn xwendekarekî baş. Lewra "xwendekarên baş" pîr caran dibin koleyekî baş ji dewletên dagirker re."

Piştî ku Xeylanî dest bi çêkirina peykeran dîke û bi serê û astengên din re tê hemberî hev. Hin mele hene ku çavreşiyê davêjine. Heta yek heye serê xwe zêde bi wî re dêsîne. Li nav xelkê digere û dibêje: Kesê ku daran bide Nezîr risqê wan ne helal e. Lewra Nezîr ji daran seneman çêdike. Di zemanê pêxember de, giş hatin şikandî. Dikana senem û pûtan vekiriye."

Helbet kes mîna melê nafikire. Kesên ku hez ji Nezîr dikin jî zehf in. Bi taybetî xortên Şeqlawe ji her kesî bêhtir li Nezîr xwedî derdikevin û jê re darên berû, mazi û gûwîzan tînin da ku peykerên xwe çêbike.

Teatra Jiyana Nû:

Tetra Jiyana Nû, di sala 1992'an de ava bû û li Navenda Çanda Mezopotamyayê a Stenbolê di herman salê de dest bi xebatên xwe kir. Lîstika wan a yekemîn bi navê "mişko" hat lîstin û heta îro; Mirin û Jiyana, Berber, Du Şivan, Germahiya Tebaxê, Jinên Bîndest, Daweya Genaralê Teneke, Ji Mirinê Veger Tune ye, Agirê Newrozê, Ta/Sê Ewrên Dûr, Axûya Spî (Guşt), Zarokên Apê Musa, Zewiya Jiyane, Bayê Elegezê, Rojbaş û Komara Dînan; Şermola lîstin.

Lîstikvanên Teatra Jiyana Nû; Yıldız Gültekin, Reşat Günel, Alishan Önlü, Kemal Orğun, Kazım Ekinci, Cabbar Barış, Avniye Ece, Ali Koroğlu, Sanije Tunç, Erhan Yıldırım, Kemal Ulusoy, Erdal Ceviz, Nazmi Kırık, Cihan Özdemir, Murat Batği, Yemlihan Adıgüzel, Rojbin Elbân, Fatma Akbal, Münife Yıldızhan, İbrahim Öztoprak, Mustafa Gizik û Osman Karakuş e.

Wekî tê zanîn hûn demê dirêj e, bi xebata şanoyê dadikevin. Gelo hûn dikarin bibêjin ku em şanoya kurdî çêdikin?

✓ Belê! Bi rastî ji pîrsa we ji bo hemû xebatên NÇM'ê derbas dibe. Ji folklorê bigirin heta muzîkê, şano û hwd... Ji bo tevahiya xebat û hunerên akademîk û civakî NÇM bîngeha destpêkê bixwe ye. Em nabêjin me dest pê kir, me xelas kir ango em hatine dawiyê. Ji ber ku, armanca me afirandina civakeke nû ye. Lewre gava yekemîn gelekî girîng e û divê ev gav şaş neyê avêtin.

Ji bo me armanca yekemîn; avakirina şanoya neteweyî ye. Li gorî vî ramanê, heger em rabin û bibêjin: "Xebata me têrî çêkirina şanoya kurdî dike" ev ne rast e. Lê Teatra Jiyana Nû hewl dide xwe ku bêkêmasî şanoya kurdî derxe pêşberî gelê kurd.

Heta îro hûn bi dehan zêdetir lîstikên xwe derketin pêşberî hunerhezan.

Em dixwazîn hûn qonaxa destpêka şanoyê û ya îro bidin berhev.

✓ Gava me nû dest pê kir, armanca me ya bîngehîn rasterast ne huner û ne jî şanogerî bû. Di destpêkê de helwesta me politîk bû. Lê helwesta me ya politîk jî bo afirandina hunerê rê vekir. Niha rastiyek heye; kurd bi çavekî hunerî li şanoyê mêze nakin. Mîrov dikare bibêje ku kurd di vî warî de kêmasî ne. Ji ber ku bi sazîbûna şanoyê tune ye. Di destpêkê de me wiha got: "Gelo em dê bikaribîn şanoyekê kurdî derînin holê?" Pîrsa me bi xwe re bersivêk jî dani. Me got divê em şanoya kurdî bikin û tekoşîna wê bidin. "Gelo emê bi serkevin an na?" Bi rastî jî temaşevan û rexnegiran bi xwe jî ev pîrsarasteyî hev du dikirin. Lê heta pêvajoya îro, em di merhaleyên dûvedirêjê derbas bûn û îro em ji gelek kêmasî û gumanên ku di destpêkê de hebûn, xilas bûn. Îro bi giştî huner, bi taybetî jî şano bi kurdî tene nivîsandin, em jî hewl didin xwe da ku şanogeriyeke kurdewarî derkeve holê. Niha em li ser pîrsên bi

Şano, divê bers

Hûn dikarin li cihekî, ku komên muzîkê Ji bo xebatên bi vî rengî tu kes a şanoyê tu car destûreke bi vî rengî gotin: "Konser û hwd. serber"

rengê: "Şanoya kurdî divê çawa bê çêkirin?" û "Di hundirê şanoya nûjen de rol û taybetmendiyên şanoya kurdî çî ye û divê çawa be?" disekin û xebatên xwe ji bo peyda kirina bersivên van pîrsan didomînin.

Motif û mijarên kurdewarî gelek caran di komên şanoyê yên cur bi cur de xwe didin der. Lê mixabin tê dîtîn ku her çiqas naverok bi kurdî be jî zîman bi tirkî ye. Hûn vî yekê çawa hel-disengînin?

✓ Bi baweriya me ev nêzîkêdayîn, bi dîtîn û ramanên dewletê ve girêdaxî ye. Dewletên mêtînger tevahiya nîrxên gelên bîndest ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Jiyana kurdan di warê şanoyê de jî, ji bo serdestan wekî materyal tene bikaranîn. Ji bo vî yekê kurd bi xwe jî dibin sedem ango ew jî sîcdar in. Kom û kesên bi vî rengî dixwazîn xwe bi sistemê re îfade bikin. Ew kes bi pîranî jî kurd in. Şanoger û hunermendên tirk nikarin motifên kurdewarî baş bi kar binin. Ji ber ku rastiya wan û bin-

geha wan gelekî cuda ye. Bi van hewldan û xebatan armanca bîngehîn veşartina rastiya kurdan e. Her çiqas bi kurdî neaxive jî, ji bo ku gotin an bîwejeke kurdî bi kar tîne ev yek hin caran ji hêla civakê ve tê ecibandin. Ev rastiyekê gelê kurd e lê helwesteke xelet e.

Îro karekterên ku Yılmaz Erdoğan dilîze di rojevê de ye. Ew bi xwe kurd e, motifên kurdewarî bi kar tîne. Kesê ku xwe wekî hunermendekî/e kurd bihesibîne, divê wekî Yılmaz Erdoğan tevne gere. Ji ber ku ev helwest jî bo ehlaqê hunerê rûşî ye û nîşaneya asimîlebûn û bînketina kurdan e. Lê ev helwest jî bo îro ne diyarker e. Bi karigeriya tekoşîna îro, ev hewldan roj bi roj ji holê radibe. Pêşketina şanogerî û hunera kurd; bêguman wê rê li ber hewldanên bi vî rengî bigire û wê bersivê baş bide kes û komên ku naveroka çanda kurdan berevajî û vala dikin.

Peywendiyên Teatra Jiyana Nû bi komên li Kurdistanê û li derveyî welat di çî astê de ne?

✓ Li ser xaka Mezopotamyayê her dem muzîk, çand, dîrok û zargotin wekî pelgên darê şax dane. Lê ji modernîzmê nesîbê xwe wernegirtine. Piştî şiyarbûna neteweyî modernîzasyon û nûjenî wekî şaxên din ji bo şanoyê jî pêk hatiye. Dema li welatekî tekoşîneke modern hebe, wê gavê şanoya wî welatî jî bi pêş dikeve. Ev yek ji bo şert û mercên Kurdistanê jî derbas dibe. Li Başûrê Kurdistanê jî dema Şêx Mehmedê Berzencî heta îro gelek tişt çêbûne. Bi vî yekê ve girêdayî zanîn û hişyarbûneke neteweyî pêk hatiye. Lê agahiyên me di vî warî kêmtir in. Divê em lêkolînen xurt bikin. "Li Mahabadê di warê hunerê de xebatên çawa hatine pêk anîn û li Ewropayê rewş çawa ye?" Divê em di vî warî de xwe agahdar bikin. Tekoşîna ku, îro li Kurdistanê tê meşandin û ku li tevahiya cihanê deng vedaye, di nav tevgerên rizgarî yên ku heta niha li Kurdistanê pêk hatine de, tevgera herî modern e. Divê şano bersiva vî tekoşîne bide. Têkiliyên me bi komên din re zêde ne xurt in. Hinek bi Ewropayê re têkili hene. Li gorî nûjenîya siyasê divê em xwe bigihînin perçeyê din jî. Li ku derê cihanê kurd hebin divê em xwe bigihîjin wan.



Dîmenek ji lîstika Teatra Jiyana Nû Bayê Elegezê

ya têkoşînê bide

re konseran didin sloganan biavêjin. Sloganan dernaxe pêşiya we. Lê ji bo me ye. Polîsên Mêrsînê jî ji me re wiha dibêjin, lê şano li vir qedexe ye."

Di listikên we de car caran sloganan derdikevin pêş? Gelo pêwîstiya hunerê bi van dirûşmeyan heye?

✓ Ev dîtin divê li gorî demê bê nirxandin. Di destpêka şanoyê de sloganên ku şanoger di nava xwe de diparêze, çawa li hember temaşevanan bi kar anîye. Ev piçek ji rastiyê dûr dikeve. Gava ku di 1991'an de NÇM hate damezrandin bi listika "Mişko" em derketin pêşberî temaşevanan. Di listikê de slogan hebûn. Û pêwîstiya gel jî bi van sloganan hebû. Ji bo ku gel hişyar bibe slogan pêwîst bûn. Ji ber ku reaksiyonekên gel tê de bê xuyakirin, divê em tiştên wisa raber bikin. Jixwe hunera ku ji gel dûr bikeve wê gavê nabe huner.

Lê îro wekî hûn jî dibînin, di listika me yê dawî de wekî berê slogan nayên bikaranîn. Ev hinek jî bi civakê ve girêdahiye. Tiştên ku îro tê kirin zêdetir hunerî ne. Gel jî îro sloganan guncaw nabîne û wekî tiştêkî ne di cih de bi nav dike. Slogan, jiyana bi xwe ye. A girîng ew e ku, slogan çawa tê bikaranîn.

Di destpêka xebatên me de me gelek tişt nizanibû. Bi kêmasî me wisa qebûl

ne be. Lê divê em vê yekê kifş bikin. Ne ku zanîneke ji derve be jî. Ev ne rast e. Hinek xebatên me yên bi vî rengî jî hene.

Di listikên komê de, carna karakter li gorî dem û statûya xwe ya civakî neaxivin. Bo nimûne gundiyekek peyvên nûjen bi kar tîne û li şûna "sax bî" dibêje "spas" û li şûna "muhîm" dibêje "giring". Ji ber çî?

✓ Ev ne derdê şanoyê ye. Divê kurd bi zimanê xwe biaxivin. Û ev pirs-girêk pirs-girêka zimên e, ne a şanoyê ye. Şanoya kurdî di nav wan pirs-girêkan de derdikeve holê û dixwaze jê re bibe bersiv. Ji ber vê yekê ew xwe di hundirê listikê de jî dide xuyakirin. Kesên ji Meletiyê cuda diaxivin, ên li Botanê cuda diaxivin. Xwestina têkoşîna îro jî ev e ku vî tiştî çareser bike. Ji ber ku şano nû ye her wiha ji bo ziman jî dibistanek e. Şanoger pêwîst e ji ziman-zanekî baştir ziman bi kar bîne.

Şano ji bo pêşketina gelan peywirekê girîng bi cih tîne. Ev di nêzîktêdayî-


Dema li welatekî tekoşîneke modern hebe, wê gavê şanoya wî welatî jî bi pêş dikeve. Têkoşîna ku, îro li Kurdistanê tê meşandin û ku li tevahiya cihanê deng vedaye, di nav tevgerên rizgarî yên ku heta niha li Kurdistanê pêk hatine de tevgera herî modern e. Divê şano bersiva vê tekoşînê bide.

dikir. Ji ber vê yekê me dest avêt tiştê hêsan. Sloganên jî di vî merhale yê de xwe dan xuya kirin. Piştî re em têgihîştin ku, divê em daxwazên xwe bi awa-yekî hunerî, estetîkî binin zimên. Di nê-rîna me yê civakî de zanebûna me xwe da xuyakirin. Ji ber vê yekê her listikek me ji listikên me yên din baştir û bi zelaltir dibe.

Rastiya civakê heye. Komek nû dest bi şanoyê bike û hûn ji van re bibêjin sloganan navêjin wê gavê wê tiştêkî derewîn çêdibe. Em sloganan diavêjin, ev reaksiyona me ye. Di bingeha xwe de dijberiya sloganan armanc û daxwaza sistêmê ye. Sistem dibêje sloganan navêjin. Bi qasî ku em hûn bûn em ê pergalê xwe biguherînin. Ku em bibêjin, em sloganan navêjin, em ê ji gel biqetînin. Dibe ku di nav hunerê de slogan tu-

na dewletê de jî baş xuya dibe. **Di demek nêzik de jî li Rihayê û li Mêrsînê hûn ji sahne daxistin û listikvanê wê jî ji ber rola xwe hate girtin û demeke di girtîgehê ma. Gelo haya gel ji girîngiya şanoyê heye?**

✓ Gelek sedemên vê helwestê hene. Ev tenê bi sazibûnê nayê ifadekirin. Gava em çûn Mêrsînê gelê vir digot, "gelo em herin şanoyê em ê çî jê fem bikin." A ku di vir de xuya dike û dibe pirs-girêk ziman e. Li Stenbolê jî gava em dilizîn kesên li vir dibêjin, "gelo bi kurdî şano çêdibe." Bi kurtayî nêzîktêdayîna gel ev e. Lê di dawiyê de xwe digihîne gel û xwe baş ifade dike. Temaşevan jî xwe tiştêkî tê de dibîne. Hûn dikarin li cihekî, ku komên muzîkê konseran didin sloganan bavêjin. Ji



Dîmenek ji listikên şanoya me...

bo xebatên bi vî rengî tu kes astengan dernaxe pêşiya we. Lê ji bo şanoyê tu car destûreke bi vî rengî tune ye. Gava ku em li Rihayê bûn polîsan digot: "Li vê derê tê xwestin ku şano bê listin. Em tu car nahêlin." Polîsên Mêrsînê jî ew ji me re gotin: "Konser hwd. serbest in, lê şano li vir qedexe ye." Û gava me listik pêşkêş dikir polîsan avêt ser me û hevalê me xistin girtîgehê. Şano tenê xwe ifade nake. Beşên hunerî yên din jî di hundirê xwe de dihevin. Şano çiqas pêş bikeve beşên din jî pê re pêş dike-

Sahnesi) de jî listikên xwe pêşkêş bikin. Berê me digot gelo, em dikarin li derveyî Stenbolê listikên xwe bilizin. Me digot gelo em dikarin herin Meletiyê, Bîngolê û hwd. Îro em jî vê yekê natirsîn. Ji ber ku temaşevanên kurd jî hene.

Gelo hûn dixwazîn di pêşerojê de listikeke muzîkalî jî çêbikin?

✓ Ev pirs hinek bi pirs "Di pêşerojê di hûn dixwazîn çî bikin" ve girêdayî ye. Belê em vê jî difikirin. Lê ne ji bo vê gavê. Dawiya dawî em dixwazîn kurd, di her warî de bi rêxistin bibin. Em îro dixwazîn listikeke bi dimilkî çêbikin. Dîsa em destanên kurdî difikirin. Em dixwazîn klasîkên biyanî li kurdî wergerînin. Ew giş bi serê xwe merhale ne. Ev proje hemû li ber me sekî-nîne.

Hinek kes dibêjin sazî hunerê dikujê. Li gorî we teklîya hunerê û saziyê divê çawa be?

✓ Ku saziyê hunerê bikujta îro em nedihatîn vê merhelayê. Û ku saziyê hunerê neanibûya vê merhaleyê, divê hunera kurdan bêyî saziyan pêş bike-ta. Ku îro muzîk û şanoya kurdî pêşketi-ye, ev bisazibûnê pêk hat. Li Tirkiyeyê ya ku ji bo pêşketina hunera kurdan hewqas hewl dide xwe NÇM'ê ye û ew jî wekî tê zanîn ku saziyek e. Ji bo pêşketina hunerê ev sazî wekî navendeke ye. Pêwîstiya kurdan bi jiyaneke bi rêxistinî heye. Îro ev pêwîst e. Di pêşerojê de divê mirov bikaribe vê yekê nîqas bike. Lê ji bo îro ev nîqaseke sumî ye.

HEVPEYVÎN: ŞEXMÛS ÖNAL

Mitirbê Wêjeyê: Can Yücel

(Diyarî ji bo Keremê Kor û Can Yücel)

*Ji roja ku ji binevşekê ketiye û vir de
Heska xwe di nîska peyvê de dike
Çi sêrbaz û zayok, zirna serê sibê
Xwedê tu kesî meke tapişê wî*

*Xwedê jî pê nizane
Zimanê tirkî çî ji destê wî dikişîne
Ku zimanê tirkî hebûya
Dê teqez bihata rehme
Dad û medet
Dad û medet*

*Ji roja ku ji siruştê ketiye û vir de
Kolan bi kolan digere mitirbê wêjeyê*

Di hunera helbestê ya tirkî de, kêm helbestvan hene ku serê hespê xwe li erdê abadinê helbestê berdîdî û bêtiş û bêasteng peyvê diajon ber bi deverine dîr ve. Huner, her tim wêrekî û dilekî mezin xwastiye ji afirînerê xwe. Di domana dîroka de, pîrsa ku çeper û tixûbên zagonan qelastîye helbest e. Lewre helbest nehatiye bersivandin, tevî ew qas xebatên akademîk yê wêjeyî. Hêj ez dikim ku ji xwe bipîrsim û wê pîrsa ku hin bi hin di mîjîyê min de cihêkî mezintir dadigire, konê xwe vedigere, bi bersivê wekî ji zeryayê dilopekê, şîrove bikim.

Helbest dibistan nîn e!
Helbest dibistan nîn e!

Helbet di serî de em dê çêli hêmayê (îmaj) bikin. Bêyî wê huner nayê afirandin. Di wêjeya kurdî de jî astenga herî berbiçav ev e. Heta em dikarin bibêjin hêma şîrava hunerê, dilê hunerê ye. Heta ew "bi zimanê kurdî" neyê honandin, em dê nikaribin behsa wêjeya kurdî ya xurt bikin û wê tu kes jî nikaribe bipirse, ka çima hunera kurdî bi pêş nakeve! Lê ku em vegerin ser hunera Can Yücel, tiştê ku zêde zelal e ev e: Di helbesta Yücel de, siruşt, heyok, heyber, mirov, bûyer, agahî, raman, averû (têgîn), hêma, dilnî, coş, pejin, pêşnûma û hwd. giş ji bo sazkirina cîhana hêmayê ya helbestî çavkanî û sedem in. Di wê helbestê de, peyvên rojane û hêmayên ku ew di naveroka xwe de dihevinin, dadigerin tiştên ku hebûna xwe ji xwe digirin. Helbesta hêmayî, dijberê pêşnûmayê an jî hêmaya derûnî ya ku rasterast hatiye dayîn an jî nehatiye honandin e. Lewre pêşnûma an jî hêmaya xwezayî ji bo heyoka ku ew dînimîne bes nîşanek e.

Yücel bi wê nîşana zirav dikeve, wê cîhana abadin. Ji wê ziraviyê û tîkiliya lawaz, pênuş dikare helbestekê ji her hêlê ve serbest û bi serketî biafirîne. Karê ku ji helbestvanekî/ê re dimîne bî tenê dagerandin û guherandin e, honandin e. Heya vir, heta radeyekê mirov dikare diyar bike ku helbestvan bi zanîn an jî bêhemdê xwe berhema xwe bi wî şeweyî tîne himatê. Lê balkêşiya Yücel ji vir der tê: Ji ber ku ew zimanê kuçeyê an jî

zimanê rojane bi kar tîne. Xemla bejna henekên wî devkî, çêr û sixêf in. Danexweya wî, mirov dikare bişibîne mizawiriya zarokê anîzar, qewlikbêjiya kalekî rind û bêriya ciwanekî anarşîst.

Wekî ku Andre Breton gotiye, Yücel peyvê "diketine" helbestê ji peyvê dipêkîne, di helbesta wî de guhên hêmayên herî nêzik û herî dîr li nav hev dikevin. Bi ser de jî debar nake û tayê bi derziyê ve dike. Ew, derfetên ragihandinê têtîjî bi kar tîne. Û carinan peyva ku bi pêşavendan, bi "lîstikên peyvan" serobin dike, bi wateyî dirûvekî ne-asayî û ne jî rêzê digirin. Peyva ku di helbesta wî de dikeve dilqekî nû, pergala tîp û kîteyan tîk dibe; peyvên ku dişibin ên em dizanin, lê yê bi awayekî nû û serincrakêş diafirîne.

Wekî naverok, hêrs û evîn jî hêmayên girîng in ji bo Yücel. Ev averû ji hev dizên û hev du aş dikin, hev du ji nû ve diafirînin. Lewre Yücel pê dizane ku ew di nakokiyê xwezayî de ji ber bêgaviyê dijî, dizane ku hem li cîhana koledariyê, xapandinê, zagonên xedar dijî, hem jî dibihîze ku di nav heyberên hêjayî hezkirinê de dijî, şidîna ku di navbera hêrs û evînê wî didê axaftin: Bi hêrsa xwe neyîniyê bi evîna xwe erênîyê tîne zimên.

Rojekê çend xwendekarên Lîseyaya Stenbolê jê dipîrsin: "Di helbestên te de şewaz



çî ye?" Wî ev pîrs wiha bersivandiyê: "Min jî got ku hin Gulebaxan dibêjin ji gula berbirojê re Hin jî gula berbiroj dibêjin ji gulebaxanê re

*Ez gula berbirojê çêtir digirim
Barikê jî ji bo ku ez berê xwe didim rojê dîsa.*

Jİ CAN YÜCEL ÇEND WERGER

Çûçikname

De bese lo çûçikno

Binêr ez ê a

*niha derî bigirim
Min got
Guh nedan min
Min ji derî negirt
Xem nake bila guh nedim min*

Dirih

*Em li ser Serdema Qeşayê rûniştine dinivîsin
Bi pênuşeke reşik ku ji Afrikayê germtir
Dihele qeşa
Ev e diriha seyr a helbestvanan*

Pesn

*Komunîzm gûhûşk e
Dermanê gireyê ye
Çawa xweşik in libên wê
Çawa xweş dibe reçela wê
Şîrûba wê jî
Fêkî ye, lê hin nehatiye vexwarin*

Salnanemaya şoreşger


*Kuro deyûsno!
We adar hilda
We rezber hilda
We 1 gulan girt ji destê me
Lê neh meh man jê
Ji bo çêbûna zareke tixis
Ne bes e
Zêde ye jî
Binêr ev e zêdebahî*

Çîkîst

*Dema em xwendekar bûn, em çîk bûn
Em bi çîkê re baş heval bûn
Her wekî dizanin mirov bi çîkê re nabe çîk
Ez, dema çîkê bavê min xelas bû
Çîk got, çûm tevli partiya çîkê bûm
Jixwe ez bi çîkê re zewicibûm
Çîkê got were em herin çîkê, em çûn
Bêyî çîkê ji nedibû em vegerin
Du çîkên min çêbûn, mezin bûn
Niha bijîşk dibêje te çîkek heye
Helbet min çîkek heye: bi qasî ku nikarim bihijmêrim
Kes nikare dest bide çîkê min
Lewre ez çîkek im
Her tişt ji çîkek e lê
Ez çîkekî cihê me
Ez çîk im*

Can Yücel

*Navê resen ê helbestê "şeyist" e.
Amadekar û Werger: KAWA NEMIR



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Stenbolê

14.02.1998 Şemf: Film-"Dema fiîna leglêgan" Derhêner: Michaîl Kalatozov. saet:18.00

15.02.1998 Yekşem: Konser-Koma Gulên Xerzan. Saet:14.00

Şano: Teatra Jîyan Nû "Komara Dînan 'Şermola'. Saet:14.00

20.02.1998 În: Film-Navê Gülê. Derh: J.J. Annaud. Saet: 18:00
Li MEDKOMÊ

14.02.1998 Şemf: Panel-Tevgera Şêx Seîd. Saet:17.00

15.02.1998 Yeşem: Konser-Cihan Kızılyavuz. Saet: 16:00

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM ya İzmirê

14.02.1998. Şemf: Konser- Strana xwewnên min saet:18.00

15.02.1998. Yekşem:

Şano- Şanoya Hêvî."Aso" Saet:14.00

Konser- Dengbêj Zahiro. saet:18:00

18.02.1998. Çarşem:

Konferas- "Merheleyên koçbûna kurdan." Beşdar: Aborîzan Ahmet Kaya.

Saet: 18:00

20.02.1998. În: Konser- Koman Dengê Biratî "Narîne" Saet: 18:00

Helbestvan û Wênekêş Mehmet Özer:

Her şehîdek parçeyekî jiyana min e



Li Şîrnexê sar e li dilê min
Û stêrk nema di bin lihêfa xewnên min de
Di mezraya de bêdengiya goristanan
Fistanên gulîgulî kefenê me.

Dilê min xwîn dinîqutîne li Cizîrê
Ji ber vê ye hawara me

Afirînerê vê helbestê Mehmet Özer, roja 7'ê reşemiyê li şaxa NÇM'ê bi navê "Lîloza ku li ser bijangên ez-mên dibişire" nîşandana dîfayê li dar xist û helbest xwendin.

Mehmet Özer, di beşa yekemîn de di gel helbestên gelek kesên bi nav û deng, çend helbestên xwe jî pêşkeşî temaşvanan kirin. Özer bi şewaza helbest-xwendina gelekî bal kişand û bandoreke xurt li temaşvanan kir. Ji gelek helbestvanan helbestên bijarte bênavber jî niv saete bêtir xwendin. Özer bi to-na dengê xwe, bi muzîkê, hestên gelek guhdaran geş kirin. Di dawiya beşa yekemîn de Özer, helbestên xwe yên ku li ser Sarya (Nursel İnce) û Gurbetellî Ersöz nivîsandibûn, xwendin. Ew di vê navberê de kelogirî bû û hêstir ji çavên wî bariyan.

Di beşa duyemîn de Mehmet Özer dest bi pêşkêşkirina dîfayê kir. Wî di gel wêneyên xwe, çend wêneyên din jî nîşan dan. Wekî tê

Bijangên me li benda baranê ne
Lê arî dibare ji asîmanan

Serî hildide dilê min li Botanê
Qirîna dilê çiyayan

Ûv hezar sal e jê nayê veqetandin

zanîn wêneyê Sarya ku di rojnameya Ülkede Gundemê de hatibû weşandin ji aliyê Mehmet Özer ve hatibû kişandin û jixwe karê wî yê rastîn jî wênekêşî ye. Di dawiya bernamêyê de, guhdaran dilxweşiya xwe bi çepikên xurt anîn zimên.


Piştî bernamêyê me xwest em sedema kelogirîbûna Mehmet Özer fêr bibin. Özer wiha bersiv da: "Kesên ku ji bo azadiyê şehîd dikevin namirin. Ez jî gava helbestên li ser van kesan dixwînim, çawa ji dilê min tê, ez wisa his dikim û dixwînim. Her şehîdek perçeyek ji jiyana min e. Kesên ku dimirin parçeyekî ji min jî bi xwe re dibin."

Li ser nivîsandina helbestê Özer, girîngiyê dide şayikbûn û herîkbariya helbestê. Bi baweriya wî helbesta ku mîna golê di ber siya xwe de dimîne ne helbest e. Divê av çawa diherike helbet jî wisa be."

A. WELAT/ STENBOL

TÎŞK

Se serewo ke
Kurdistan kenê
tal (2)



KAZIM TEMURLENK

PKK 1978 de verva polîtîka tirk vejîyê wertê. Dewleta tirkî wast virendiyê bizero, hama gama 1984 re şipkiyê mane bo. Polîtîka seşt serî biyê teser tebin ra. Kirmancî kerdî mezele, ser jî beton kerd bî, hama yîno beton kerd letey, kerd pum reyna vejîyay cere çime dîna. Hande eslqrim (söyqir-im), surgun, asîmîlasyon ra dima kirmancî onca hesâr bî. Kemalîzmî nay êde qizkeçîna xo diyê. Neçe ser bi jû millet, jû zon, jû dewlete sero hurînde xo kerd bî peyîm. Hama onca kirmancî verva na polîtîka vejîyay ko. Kemalîsto polîtîka xuya qîlerine onca gurene, ebi bombone axoyo şîye gerîla ser. Gerîlaye ku wes pê guretî ebe îşkence kişî. Gosone pîrnîkone gerîlawo ra koleksiyonî viraştî. Koye ku neçese serî millet re wayîrîne kenê, yîno mixaro, eskefto, birone, xode darene we, yî koyî bombanê kerdî. Birî vesnay, mereye qorî kerdî. Hete debara ra millet fist werte tenge. Mal gayî, mesin neverda dewe ra tever bo. Golîgî millet dest ra guretî, sanay qersuno ver. Suko de şî dewlemendone kirmanco ser, xeled mordemî kişî. Nûstox, rojnamevanî, welat heskerdaxî, sermiyane milletî hergu jû caye de kerd vînd. Kurdistan de mezrey dewî neverday. Nîjdiye çor hazar dewî vesnay, riznay kerd tal. Yî dewe ke mende yîno de çî zaf millet nêmend. Ebe eroyn esrar xortê ma kerdî rawone qîlerino. Ebe ambargoy millet kerd tenge. 1984 ra dima dewlete hergu her ra amê kirmanco ser. Kurdistan kerd wêrane. Nufûsa kirmanco hama hama lete surgun kerd.

Niya honde millet çufor vejîya binê pagone xora, hurîn da mezalone pî kâlîko, derû cîran çitur caver da. Kirmancî welate xora, herde xora, milletê xora zaf hes kenê. Hata ne mire, bê welat, bê millet, bê herde xo nişkîne vindere. Hama bê niyade ke dewleta tirkî kirmanc mendene ra dayina kerd beter.

Dewlete polîtîka xo taye ca berde sere. Hama hona dewam kena. Bakur çitur ke kerd tal nika wazena Başûr çî tal kero. Çitur ke Antakya kibris guret nika wazena, ke Başûr taye ca kirmanco ra ra tal kero, ebe deste tirkemeno-ûza jî îşgal kero. Xora nika eskere xo uzaro. Hama wazena ke rind bizero binê qontrolê xo.

Na rozone peyîno de hergu roz ebe hazaro millet vejîno tever. Le tera zê de kirmance Başûr yê. Çîqa ke taye millet vano tirk henî kene ke Ewropa tenge kero, ebe na polîtîka vazero Turkiye cenê wertê Ewropa bicere, necene millet pero êno Ewropa. Dewleta tirkî jî vana: PKK millet vezena tever cira pero cena. Nî hurdmîna diyayîş ji raşt niye. Belka taye ca tirkî wazene ke Ewropa tenge kerê, haşa bînge na polîtîka de talkerdene Kurdistan esta.

Verva na polîtîka kirmancî gerek e polîtîka xo reyan biyare verê çimone xo. Napolîtîka Ankara ra vejîna. Gereke verva Ankara polîtîka wa raştî biyarme werte. Kam ke nêwazeno Kurdistan tal bo verva polîtîka dewlete vindere. Naye de kam ke paşt dano dewleta tirkî o jî qirim û talkerdene Kurdisan re beno wextex.

Wê demê Kejê li Salo vedigerîne û dibêje:

Lo de lo lo, lo de lo lo, Salo lawo de lo lo
Êdî ava reş bi çavên te de nehata
Kuliyan zimanê te nexwara
De vê sibehê şevqa sibehê li me ronî kir
Stêrka sibehê li me sipî kir
Te sê salan ji bavê min re xulamî û na
malî kir

Te salakê ji mêrê min re seyîsî kir
Ava reş di çavên te de nehatibû û kuliyan
zimanê te nexwaribû
Madem ku çavên te di bejna Keja gulîsor
de hebû
Heta niha te çima negot te bi derengî kir.
Êdî haydê, de haydê Salo lawo de haydê
qonaxa me dûr e.

Salo li Kejê vedigerîne û dibêje:
Lê zeriye, lê zeriye, lê zeriye, lê zeriye
Berê şevqa sibê li me ronî kir
Stêrka sibê li me derket û sipî kir
Min sê salan ji kûçikê bavê te re xulamî
û navmalî kir

Min salekê ji kûçikê mêrê te, lawê mirê
Palo re seyîsî kir
Malxerabê tu nizanî; gava çavên min bi
Bejna zirav, eniya gewer, gewdeyê mezin
Cilên şevreşên dikanî û etarên berberî
Top û melesên têrkani, xizemên ridwanî
li pozê te yê mêkewî

Û bi awirên çavên te yên reş û belek
diketin
Devê min dihat girêdan, malxerabê pê re
zimanê min nedigeriya
Min ji awirên çavên te ji xwe re fedî kir
Êdî haydî de haydê, gulîsora min de
haydê qonaxa me dûr e.

Kejê li Salo vedigerîne dibêje:
Êdî lawo Salo bengî bi min bengî, bengî
bi min bengî
De rabe xwe girêde, dîsa weke caran bi
şal û şapikên qehwerengî
Madem ku dilê te di min de heyê
Malxerabo tu yê navê min û xwe li nav
bajarê Palo nekî dengî

Salo li Kejê vedigerîne û dibêje:
Ez Salihe Naso yê sebî û dîn im
Xwediyê şûrê dev bi êşin im
Ez teyrê doxanê baskê hêşin im
Hêçim. Lawê Evdîn Paşayê Gurgîn im
Ez qetaban radikim, kostek û zincîran
diqetînim
Ez ê yan vê sibehê serê xwe bidim ber
riman û şûran

Yan jî ez ê bi destên Keja gulîsor bigirim
Ji xwe re ji bajarê Palo bigirim
birevînim.

Di vê heyecana wan de, lawê mirê Palo
mêrê Kejê di ser wan de tê. Salo direve û
Kejê di hundir de tê girtin. Lawê mirê Palo,
Kejê ku digire dest û lingên wê li kelemçan
û li qeydan dixîne û diavêje pişt heft
deriyên hepsê, bê qatix ku ew bê kuştin.

Saloyê ku ji bajar reviyaye, van tiştên
pan pê dihesê û cardin bi dizîka vedigere
nav bajar dihere ber hedadan. Ew heft
deriyên hepsê yên hesinî ku Kejê xistine
pey wan, kilitê wan deriyên van hesinkaran
çêkirine. Salo xwe diavêje bextê wan.
Hesinkar (hedad) ji Salo re dibin alîkar û
Salo şeva nivê şevê tevayî deriyên vedike û
li ber serê Kejê rûdine. Kejê jî, hema ku
nefesa dawîn tê de maye. Ne bi du çavan bi
hezar çavan ji halê xwe re hêstiran
dibarin. Salo, dest û lingên Kejê jî



Destana Salihe Naso û Kejê (2)

kelemçan û qeydan vedike û bi destê Keja
gulîsor digire û ji bajarê Palo direvine. Diçe
xwe diavêje ber berxê Hesên Paşa ku ew jî
mêrê sê jinan e û mirê Çermûgê ye.

Salo û Kejê piştî ku heftêkî li mala
Hesên Paşa dimînin, Kejê, rojekê li nav
derî sekiniye û destê xwe avêtiye wî alî û wî
aliyê derî. Hesên Paşa jî, kalekî heftê heştê
salî ye û mesîna destlimêjê girtiye çûye ji
xwe re destlimêja xwe girtiye û tê, di vê
gavê de tê çavên wî li nav derî bi Kejê
dikevin. Jixwe, Kejê jî berê xwe daye tavê
û şewq û şemala xweşikbûna Kejê û zêrên
di sing û ber û di zend û bendên wê de
neketine nava hev. Ev şewq û şemala han li
ser û çavên Hesên Paşa dikevin. Hesên
Paşa, ji ber şewq û şemala xweşikbûna
Kejê dixeriqe, ji xwe ve diçe û dikeve. Kejê
ku vê yekê dibîne, dihere destê wî digire û
dibêje:

“Apo, apo çi bû bi te?” Hesên Paşa
çendî çavên xwe vedike û li Kejê dinihêre
cardin dixeriqe û ji xwe ve diçe.

Paşê xulam wî radikîna tînin hundir. Hişê wî
tê serê wî, dibêje:

– Ew kî bû? Ew kî ye hatiye mala me?” Jê
re dibêjin:

– Ew Kejê ye? Saliho Naso ew revandiyê
haniye mala me.

Wê demê Hesên Paşa dibêje: “Xwedê
seyda (nêçîr) min haniye ber lingên min.”

Hesên Paşa, xwedî şeş sed leşkerên
siwarî ye. Gelek xulamên wî hene û ew
welat jî tev di bin destên wî de ye. Hesên
Paşa dibêje: “Gazî xulamên bikin.” Û fer-
manê derdixe:

– Salo bigirin, biavêjin zîndanê. Jixwe
xwedê seyda min haniye ber lingên min.
Ezê Kejê li xwe mar bikim. Bila, Salo jî li
zîndanê bi hefsa bêqatix bimire.

Xulam, Salo digirin dibin diavêjin zî-
ndanê. Salo radibe ji zîndanê nameyêke ji
Hesên Paşa re dişîne ku tê de nivisandiyê:
“Hesên Paşa, Îro tu paşayekî mezin î.
Hewqas welat di bin destên te de ye. Hew
qas leşkerên te hene. Tu vê bêbextiya han li
min dikî ne heta dîrokê hebe wê behsa vê
bêbextiya te bê kirin. Madem çavê te li
Kejê ye, qet nebe vê bêbextiya han neke.
Tu were min berde û destên Kejê bike
destên min em ê herin. Paşê, leşkerên xwe
li biniya malan bişîne pêşiya me, bila min
bikujin û Kejê bigirin ji te re bînin. Ma ez
teyr bim ez ê nikaribûm ji nav destên te
bifirim.”

Hesên Paşa dibêje: “Bi xwedê eynî
weke Salo ye.” Ferman dike, dibêje: “Zû
herin Salo ji zîndanê derînin.”

Xulam diherin Salo ji zîndanê derdixin,
zikê wî û Kejê têr dikin û wan berdidin ku
herin. Jixwe, Hesên Paşa hemû rê bi pênçî
siwarî daye birîn. Salo û Kejê bi kîjan rê de
herin, leşkerên Hesên Paşa li pêşiya wan in.
Salo û Kejê rîya ku tê diçûn jî pênçî siwarî
li ser bûn. Siwarên, di jor de gazî Salo kirin,
gotin: “Bexem, keçikê bihêle û here. Tu
heyf î, em naxwazin te bikujin.” Salo, rabû
Kejê di cih de hişt û reviya. Siwar hatin
dest avêtin Kejê ku berin lê, keçik nare.
Siwaran hatin dest avêtin guliyên Kejê û bi
darê zorê di erdê de kaşkirin. Wê demê bû
qîrîna Kejê û deng li Salo kir, got:

Lo, nere, lo nere, law Salo nere
Êdî min tu bi qurbana guliyên egalên
gerandiye

Hela tuya bi carekê li pey xwe vegere
binihêre

Çawan bi destê Keja te ya gulîsor girtine
Di rê de de kaş dikin bi darê zorê
Dibin ji mêrê sê jinan, kalê heftê-heştê
salî re

Wê demê damara mêraniyê bi Salo
digire, di ser Kejê de ve digere û diqîre,
dibêje:

Lê, Kejê, ez Salihe Nasoyê Sebî û dîn im
Ez xwediyê şûrê tûjê dev bi êşin im
Ez weke teyrê bazê dev bi xwîn im
Ez berxê mala Evdîn paşayê Gurgîn im
Hela tu îro li mêran temaşe bike
Ezê çawan Hesên Paşa bi tevî pênçî
siwarî

Çawan bikujim, bi qurbana guliyên sor û
egalin bikim

Û li dora Keja gulîsor bigerinim.

Ji xwe, çavên Salo sor bûne û damara
mêraniyê pê girtiye. Dest diavêje şûrê xwe
û dikeve nava siwariyên Hesên Paşa. Mêr
ew e ku ji mala xwe nehatibû. Salo tevan
dikuje û bi destê Kejê digire, her yek dibin
siwarê hespekî ev car berê xwe didin
welatê Silvan. Dikevin deşt û beriyan.
Welat bi welat digerin. Welhasil diherin
mala kîjan axayî, tim çavên wan li delalbû-
na Kejê ne û li pey kuştina Salo digerin.
Paşê, diherin mala axakî û ew jî bêbextiyê
bi wan re dike. Salo dixapîne û b xwe re
dibe seyde û li çolê bi bêbextî wî dikuje.
Vedigere tê û ji Kejê re dibêje: “Bila serê te
sax be. Seydvanên xelkê îro bi xeletî Salo
kuştine.” Kejê bala xwe dide, bi rastî ji Salo
hatiye kuştin. Û wê axa jî wî li xwe mar
bike. Radibe, nivê şevê xencerê xwe ya
sorani, ji ber xwe derdixe û xwe diavêje ser
xencerê û xwe dikuje. Û miradê wan nagi-
hêje meqsedê wan.

Pirtûka nû ya İsmail Beşikçi:

Vejîna Kurdistanana Xeyalî

Beşikçi wekî her car Tevgera Azadiyê ji ber helwesta wê ya ji bo zimanê kurdî rexne dike. Bi baweriya wî, ji bo afirandina mirovên nû û xwedî kesayetiyeke azad, ziman di nav hêmanên bingehîn de cih digre.

Piştî têkçûna Serhildana Agirî, di 19'ê rezbera sala 1931'yan de, di rojnameya Milliyetê de karikatûrekî balkêş tê weşandin. Di vî karikatûrî de, li ser lûtkeya Çiyayê Agiriyê gorek hatiye çêkirin û li ser kêla gorê wiha tê nivîsandin: "Termê Kurdistanana xeyalî li vêderê veşartî ye. (Muhayyel Kurdistan burada meftundur)". Bi baweriya dewleta tirk, piştî Serhildana Agiriyê, wê kurdan hew cesaret bikirina ku li dijî dewleta tirk serî hildan. Wan wisa hêvî dikir ku, Kurdistanana xeyalî di dil û mêjiyê kurdan ji hatibû kuştin.

Belê, ev karikatûra ku li ser hevoka "Muhayyel Kurdistan Burada Meftundur" hatibû nivîsandin, ji bo pirtûka İsmail Beşikçi a nû re bûye berg. Ev pirtûk bi navê "Vejîna Kurdistanana Xeyalî (Hayalî Kurdistan'ın Dirilişi)" di nav weşanên Aramê de derket ji 151 rûpelan pêk tê.

Civaknas-Nivîskar İ. Beşikçi, di serî de nixandinek li ser rewşa kurdan a berî Pêngava 15'ê gelawêjê kiriye. Di vê beşê de Beşikçi, têkoşîn û hewldanên li dijî dewleta tirk, rewşa rewşenbûrên kurd û tirk û egera biserneketina wan tîne zimên. Bi taybetî ji li ser dîtin û ramanên E. Xanî ra-

diweste. Ew, E. Xanî, di warê neteweyetî û yekîtiyê û hwd. de, wekî zana û filozofekî tekane heldisengîne. Ji aliyê ramanî ve, di serdema berî wî de û serdema piştî wî de kesekî ku gihîştîye asta wî nabîne. Analîzên E. Xanî yên li ser parçebûnê, yekîtiyê, neteweyetiyê û dîtinên Serokatîya PKK'ê dîde berhev û pratîka PKK'ê wekî bicihanîna wasiyeta E. Xanî binav dike. Li gorî Beşikçi her çiqas mîna serhildana Bedirxaniyan, Serhildana Yezdanşêr, Mîr Muhamed, Ubeydullah Nehrî û hwd. qewimîne ji di van serhildanan de karîgeriya (tesîr) ramanên E. Xanî xwe nedane der. Her wiha Beşikçi di raman û şewaza siyasemedar, ronakbîr û rêxistinên kurdan de ji li taybetmendiyên kesayetiya E. Xanî rast nayê. Lê ew, Serokatîya PKK'ê di vî warî de, wekî yekemîn şexsiyet dibîne û mîsyona PKK'ê wiha şirove dike: "Her çiqas pêşengên Serokatîya PKK'ê tune bin jî, lê dîvajoyên PKK'ê pêk hatine û ji bo vê yekê bingeh hatiye avêtin." Ev rewş ji cudayetiya di navbera Serokatîya PKK'ê û E. Xanî de nişan dide.

Di beşên din yên pirtûkê de, bi giştî li ser du mijaran tê rawestîn. Mijara yekemîn, li ser guherînên siyasî, civakî û çandî

yên ku piştî Pêngava 15'ê gelawêjê, di jiyana kurdan de pêk hatine ye. Beşikçi "guleya yekemîn" wekî jiyana nû, mirina jiyana berê dibîne û wiha dinirxîne: "Bi guleya yekemîn re kurdan hemû nixê xwe yên berê yek bi yek guhartin û li gorî şoreşê xwe saz kirin. Êdî kurdan rewşa xwe ya xirab baş dîtin û ji bo ku rê li ber kiryarên ne mirovî bigirin bi rê û rêçikên zanistî dest bi têkoşînê kirine. Ev têkoşîn keç, xort, kal, pîr yên ku ji bir û baweriyên cuda ne di heman eniyê de dide şer kirin. Van rûdanan, di heman katê de, di çanda civakê de guherînên berbiçav pêk anîne. Li aliyê din bi vekirina sazîyên çandî re tê xwestin ku rê li ber pişafînê bê girtin û di vî warî de ji gavên gelek baş hatine avêtin." Beşikçi her wiha balê dikşîne ser rewşa jin û artêşa jinan di nav PKK'yê de. Damezîrandina artêşêke jinan mîna taybetmendiyêke PKK'ê ya herî erênî dinirxîne.

Mijara duyemîn jî li ser bikarneanîna zimanê kurdî ye. Helwesta İ. Beşikçi ya ji bo zimanê kurdî hêjayî pesn û gotinê ye. Beşikçi wekî her car Tevgera Azadiyê ji ber helwesta wê ya ji bo zimanê kurdî rexne dike. Bi baweriya wî, ji bo afirandi-



na mirovên nû û xwedî kesayetiyeke azad, ziman di nav hêmanên bingehîn de cih digre. Mamoste Beşikçi wiha dom dike: "Balkêş e ku, her çiqas têkoşîna gerîla di her warî de coş û dilxwaziyeke mezin pêk aniye jî lê heman tişt ji bo zimanê kurdî pêk nehatiye." Ew, vê yekê bi karîgeriya (tesîr) mêtîngêhbûna mêjiyan ve girê dide.

Weşanên Aram/Asmalî Mescît mah/Terkoz çiknazi/Karaaslan apt. Kat.1/No:104/Beyoğlu/Istanbul.

RÊNAS LALEŞ

Nivîsa nivîskarê me nekete destê me

CELALETTİN YÖYLER



Serokê Giştî yê HADEP girotiya binçim

New-des rojî yo hema hema her roj polisê dewleta tirkê bananê HADEP rê vardayin virazenê û zek talan kirê kulik kulik geyrenê. Serok, sermayan û endamanê partî genê binçim.

Vardayinî giranî meytê gerilayê ARGK'ê Adnan Şekerî, hewadayin peyra dest pê kerd. Hewadayina meytê gerilayê Adnan Şekerî peyra, polisane siyasiyanê Stenbolî verî şaxê HADEP'a Gazîosmanpaşay rê, wijay peyra jî mabenê HADEP'a Stenbolî rê vardayin viraşt û hema cayê banê partî kulik kulik geyray, dest na takwîm û arşivê partî ser.

Nê vardayinanê Stenbolî peyra 10'ê meng de jî, polisane Enqerey banê Mabenê Giştî, Mabenê Enkerey û şaxê Altındağî rê vardayin viraşt. Goreyê dazananîna HADEP, DGM'ya didiyin qandê bananê partî geyrayin biryar dawo. Nê biryarî ser, polisane Enqerî eynî seat de hem banê mabenê giştî hem banê mabenê Enqerî û hem jî şaxê Altındağî rê vardayin viraşt, dest nawo takwîm û arşivê partî ser. Polisane nezdiyê çihar seatan mabenê giştî yê partî de qereqol nawo ro û êkê mabenê giştî de biyê, fotografê inan anto û endamanê partî ra Suzan Ön-

cel, Mehmet Mekurî û Nihat Doğaner girotê binçim.

Ancî eynî seat polisane banê Mabenê Enqerî rê vardayin viraşt wija jî dest na takwîm û arşivê partî ser û sermayanê partî Dursun Turan tehdît kerdo. Vardayinê şaxê Altındağî Enqerey jî, zey vardayinanê binan, dest na taqwîm û arşivê partî ser û zereyê banê partî kerdo vila.

Wa keyanê çetan bigeyrê

Nê hemû vardayinan peyra Serokê Giştî yê HADEP Murat Bozlaşî vardayinî protesto kerdî, giranî vardayinanê peyinan sero vindard û wina vat: "Bêwextê darbeya 1980, qe jew banê partî rê û mabenê giştî rê vardayin nêvirazya. Jû fin şaxê ÖDP rê vardayin virazya. La belê partiya ma rê, hetanî nika xeylê vardayinî virazya. Xulkê polisano beno teng, iyê bananê partiya ma rê û keyanê endamanê ma rê vardayin virazenê."

Serokê HADEP Bozlaşî vat: "Vardayinê ke ewro bananê ma rê virazya ne siftayê û ne jî iyê peynî bê." Peyra Bozlaşî vînanîne xo wina ardî zîwan:

"Şaro çiqas ma rê wayir vejyeno, destekê xo dano ma, dewleta jî vardayinanê xo hend kena vêşî." Serokê

HADEP dazananî ke, dewleta tim û tim banan û keyanê partîda ci rê û mûxalifanê binan rê vardayin virazena. Serok, sermayan û endamanê ci gena binçim û ci tehdît kena. Bozlaşî wast ke, dewlet wa bananê demokratî û şoreşgeran rê vardayin mevira-zo, wa şiro banan û keyanê çetan bigeyro. Çimke keyeyê demokratî û şoreşgeran pak ê. Serokê HADEP Bozlaşî, peyniya-qisanê xo de vat: "Serdarê dewleta tirkê jû kişt ra demokrasî ser, haqanê mardiman ser qisey kenê, la belê kişt bîn ra jî bananê partiyanê siyasiyan rê û banê mabenê partiya siyasî rê vardayin virazyeno. Nê kerdenan ra jî oyo ayseno ke serdarê dewletê zey verî zûrî kenê û wazenê qisanê rindano bixapeynê.

Ancî polisane siyasiyanê Enqerî 12'ê meng de fina banê Mabenê Giştî yê HADEP rê vardayin viraşt û serokê giştî Murat Bozlaşî, cagenoyê serokê giştî Mehmet Satan, sekreterê giştî Hamit Geylanî, amorkarê giştî İshak Tepe, cagenayoê sekretê giştî Zeynet-tin Unay, endamê meclîsa partî Ali Riza Yurtsever, Melik Aygül û xefiyayanê mabenê giştî ra Mehmet Kaya û Ayhan Yeğin girotî binçim.

MEMED DREWŞ

Xwarina kundir

Sê heval diherin bostanekî, du heb pe-têxan dixwin. Yek jî kundirekî dişkê-ne û dixwe. Hevalên wî bala xwe didinê ku hevalê wan kundir dixwe. Jê re dibêjin:

- Tu kundir dixwî malxerab. Ewê ku tu dixwî kundir e. Ev bi xavîti nayê xwarin. Divê mirov bikelîne û bixwe. Kesê ku kundir dixwe jî hevalên xwe re dibêje:

- Welleh ez nizamim kundir çiyê, hema hênikaht-ye û ez dixwim!

Bavê xalê xwe

Faîzdarek ji bo ku diravên xwe bi faîzê bide, xwe ji mirovan re dike dost û heval. Pirê hevalên wî qumarbaz in. Mala wî li navçeya Dêrikê ye. Ji ber ku emrê xwe xwariye, ji hevalên xwe re dibêje: "Bavê xalê xwe wiha bû bavê xalê xwe wiha çû..." Devê wî wilo hîn bûye. Rojekê kuçik tên, ji bo ku devê wî hîn bûye, ji kûçik re jî dibêje: "Hoşt bavê xalê xwe, hoşt bavê xalê xwe."

Zebeş yek e

Yekî kurd û yekî tirk hev dinasin û di navçeyekê de dijîn. Rojekê yê tirk, radihêje pîreka xwe û zarokên

xwe dihere mala yê kurd. Ê kurd pir feqîr bûye. Di mala wî de hebek zebeşê wî hebûye. Ji pîreka xwe re dibêje: "Ka ji me re zebeşekî bîne." Pîreka wî dihere zebeş tîne. Xwediyê malê ji pîreka xwe re dibêje: "Viya ne baş e, viya bibe, yekî baş bîne." Pîreka wî vedigere hêla malê. Û di sa wî zebeşî tîne hinda (cem) mêrê xwe û di sa mêrê wê dibê: "Vayê ne baş e, yekî din bîne." Werhasil, pîreka wî heft caran wî zebeşî dibe û tîne. Qet wechê xwe tal nake û peyva mêrê xwe naşkîne. Bi kêf û eşqeke mezin, li gorî halê xwe xizmeta mêvanê xwe dike. Di pey re mêvanê wan dihere.

Çend roj dikeve wê navberê, rojekê yê kurd jin û zarokên xwe dide pey xwe dihere mala yê tirk. Ê tirk ji di pîreka xwe re dibêje: "Kanî ji me re zebeşekî bîne. Li mala wan jî zebeşekî tenê hebûye. Pîreka wî dihere zebeş tîne. Mêrik jî wekî yê kurd ji pîreka xwe re dibêje: "Ev ne baş e yekî baş bîne." Pîreka wî hema di dev de lê vedigerîne dibêje: "Ma ji xeynî viya tu g...zebeş di mala te de heye ku tu dibêjî zebeşekî din bîne."

Seydo Başçî-Mehdî

Mîrê ma çi aqilo

Dewa Eyndarî hawa roca-wanê Hezro de. Eyndaricî her ku serê siweyna şinê Hezro tîca rocî dana miyanê çimanê înan ro. Helê şanîna ku dayin û girotinê xo sûkê Hezro de qedênenê û ageyrenê Eyndar, hewna tîca rocî dana miyanê çimanê înan ro. Vanê:

- Ma go se kerin destê ena tîca rocî ra? Ma ra çi wazena? Peynî de biryar gênê ku şê verê mîrê Hezro. Belkî, mîr înan rê çarêk mivîno. Warzenê şinê verê mîrî, derdê xo ci ra qisey kenê. Mîr vano:

Şima go min rê dêzêk rûno nivîşk, yew tantûr û yew zî goştê qelî biyarê, belkî ezo şima rê çarêk bivîni. Şinê ci rê ê çiyana anê. Mîr vano:

- Şima ta enka serê siweyna amayne Hezro û şanwana ageyrayne Eyndar. Şima go tiya ra pey helê şanî biyê Hezro û serê siweyna ageyrê Eyndar.

Eyndaricî ku ana kenê,

hendî tim roc kono qey înan û tîcî nêgunena çimanê înan ro, vanê:

Veywê Eyndarican

Rojek Eyndaricî yew veywe anê. Kurdan de adet o ku gama vewye biyarê, gere weywe miyanê berî de yew cer erd rodo û bişikino. Eyndaricî zî yew cer danê destê veywe. Çira destê aye nêkono zerê cerî. Kenê, nêkenê destê veywe zerê cerî ra nêveciyeno. Risipeyê dewe cemeyenê pêser ku çarêk bivî-nê. Peynî de biryar danê ku destê aye bi birik tera kerê: Veywe, anêna îş xira wo, go destê aye biyo terakerdin. Hema cer dana erd ro şikne-na û destê xo tera vecena. Eyndaricî heyret manenê û vanê:

- Ena veywê ma zahf bi aqil a. Wa tiya ra pey ena vewyê ma bibo sermiyanê ma.

Arêkerdax: Roşan Lezgîn

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (107) XAÇEPIRSA

Qeser	Çinavkêk	Yemane	Edil	Heft	Çarçûk
Şehîdî	Adin	Pringî	Dîmanî	Adin	Adin
M	E	H	M	E	T
R	Î	L	A	S	A
J	I	N	E	B	Î
D	A	N	Î	S	Î
C	N	I	K	V	L
T	R	P	A	K	
K	Î	R	Î	L	N
F	E	N	E	K	O
T	Î	Z	M	A	R

PEYVA VEŞARÎ


Bersiva Xaçepirsa 105'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin.

Xelata hejmarê me ya 107'an Pirtûka Ali Yılmaz "Vatan Toprak Kokuyordu ye"

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



War	Papazî	Rengok	Cinavkêk	Aj	Bi kirdkî havîn
Rewşenbîr ek (wêne)	Tayê hîryê	Adil	Hejmarek	Bi tirkî Dûpişk	
Emare		2		Tipeke kurdi	Tipek
Dawera karbonê				Hev	Paşgîrek
6	Hejmarek		Hêrandin		
	Qerfokî		Pile	3	
Bermayiya dûxanê	Dijberê ron				7
	Nîninend e		Navekî mîran		
	1		Parçe		
		Paşgîrek		Bêhn	4
		Gelekî Kafkasî		Tune	
Nuh		Paytexta Yemênî			
Îltîca		Billind			
Dimdimê			Rojek		5
Helbestva nekî farts	8		Tipeke kurdi		
				Dengdêrek	

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8

Pênc kesên ku xelata hejmarê 105'an kasetê Komana Dengê Biratî (Narîne) qezenc kirine: Medeni Alpkaya/Amed, İbrahim Altınışık/Êlih, İdris Bedirhan/Amed, İbrahim Keskin/Semsûr, Süleyman Yıldırım/Êlih

Musa Kart — Cûmtîriyeyê



Rastiya qetlîama Zîndanê

Oyo ke tepşiyayê rê virazyawo wahşet o û hem jî wahşeto gird o. Nê kerdenanê heyeta mahkama ra oyo ayseno ke, mahkamey xoser niyê. Ek na mahkama tiya teva mekiro, mayê dahwa bemi Mahkamawa Haqanê Mardimanê Ewrûpa û haqê xo wija bigeyrim.

Vardayino ke 24'ê rezbera 1996 de tepşiyayê Zîndanê Amedî rê virazyawo, des tepşiyayey kişyay û vîst û hîrê tepşiyay bî dirbetinê giranî û mahkamawa ke haqê persbenoyanê na qetlîam de abiyê 6'ê meng de banê DGM'ya Amedî de virazyawo. Sûcdar û parêzgerê ci tewrê mahkama nêbî. La belê îfadewo ke ebi talîmat waziyabi, o rişt û mahkama de wanya. Heyeta mahkama vatenê ke dozgerê ardîbî zîwan û vafîbi: "Tepşiyayan çiwana û kardiyanan sermayenê zîndanî rê vardiyay virazto" ê kerdî zûfî. Heyeta mahkama vat: "Geyrayino ke verdê vardayin qawîşan rê virazyawo, ê geyrayinî de qe jew hacetê vardayin nêvinyawo."

Tepşiyayê ke vardayin de bibî dirbetinê giranî inan ra, Nusret Yelboğay biyayinê vardayinî wina ardî zîwan: "Rojê vardayin çinawo ke ziyaretkaranê ma ard, ma qandê ê çinay zere berdî embazanê qawîşa bîn ra legan wast. Gardiyanan jî vat zew bî qawîşan ra teva waştin biyo qedexa. Badê çend deqan jî persbenoyê (mudurê) zîndanî ame û ma tehdît kerdim û keverê korîdoran racena û çend seatî ma korîdor de ternay mi. Ne virada şimi ziyaret û ne jî virada şim qawîşanê xo. Bado jî 2 kıştanê korîdorî ra polis, esker û gardiyanî jopana, qelesana û çiwane demirana resay ma û inana day ma ro. Taybetî jî dayê seredê ma ro û wastê ke, ma pîrînan wija de bikşê. Bado ma pêro kaşkerdina berdîm çekardim (eystim) cayê ziyaret û nafin tiya, ê demîran û çiwana day ma ro. Tiya de

embazanê ma ra Rîdvan Bulut, Mehmet Nimet Çakmak, Sabri Gümüş, Erkan Perişan û Mehmet Aslan kişyay. Peyra ma riştîm Dilok, embazanê ma ra Kadir Demir jî ray de mard."

Sûc eşkere wo, sûcdar nêayseno

Parêzgeranê maxdûran û kişyayan ra parêzger Sezgin Tanrikulu vat: "Vardayin eşkera wo ke qetlîam hetê kamiya virazyawo, oyo rind ayseno. La belê qe jew sûcdar tepşiyay niyo. Ek sûcdarî niyê doz çî ra abiyê? Mayê wazem ke wa sûcdarî tepşiyê, film û fotografê ke wextê vardayin de ancîyayê, wa ê jî bidîyê ma." Parêzger Fethi Gümüşî jî vat: "Kişyayinê mardiman eşkero wo, gerek nînan ser qiseykerdî nêbo. Çimke geyrayinê qawîşan de qe jew hacetê sûcî nêvinyawo. Ek zey vatenanê sermayan, îşyan bo bile, kerdenê ke, tepşiyayan rê virazyayê, cayê nê kerdenan hûqûqî de çinyo. Mayê wazem şima sûcdaran biyarê mahkama verde, maxdûrana biyarê pê rî."

Ancî parêzgeranê kişyayan ra parêzger Mustafa Özerî vat: "Ek na doz (dahwa) çarêser nêbo, dozya Yüksekova û Susurluk çarêser nêbena. Çimke binê hemû meselan nay ra ravêreno." Heyeta mahkama qisanê pa-



Nezdiyê, hezar kesî sloganê 'şehîd namirina', qetlîam protesto kerd.

rêzgeranê pey ra qandê ewraqanê kemiyan û kemiyanê bînan mahkama taloq kerd û çekerd 13'ê menga adara 1998.

Taloqkerdîna mahkama ser, hetê komîsyonê doz, mahkama ver de eşkerakerdîna virazyawo wahşet o û hem jî wahşeto gird o. Nusret Yelboğay heme çî kerd eşkera. La belê ancî jî heyeta mahkama teva nêkerd. Nê kerdenanê heyeta mahkama ra oyo ayseno ke, mahkamey xoser niyê. Ek na mahkama tiya teva mekiro, mayê doz bemi Mahkamawa Haqanê Mardiman ê Ewrûpa û haqê xo wija bigeyrim."

Kışta bîn ra şarê Amedî qandê mahkama temaşekerdîna û şehîdanê xo rê wayir vejyayin goş nêkewt varaziya û nezdiyê hezar cenî, camêrd û qeçekî şewra rew adliye ver de amey pêser. La belê polisyan nêvirada kes mahkama temaşê bikiro. Nêviradayinê polisyan ser şelikî nêviradayin tilîfî û çepikana protesto kerde û sloganê "Şehîd namirin", "Zîndanî veng (tal)bê tepşiyayan rê azadiyin", "Kıştox û Çeteyê zere de" û zey nînan çekerdî û bî vilay.

ZEYNEL BAĞIR
Çarnayox: M. Drewş

WELAT

ISSN 1301/7497

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
REFİK İNCİR

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:

(Nünerê Giştî yê
Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:

Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:

Jana Seyda
Helîm Yûsiv

Berlin:

Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:

Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:

Robîn Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:

Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:

S. A. Fewzi
31 04 85 55 43

ÛLKEDE

Ji Gündemê

ŞER Û MEDYA

Di destpêka her rojê de em difikirin ku, gelo wê îro li Tirkîyeyê qewimîneke bi çi rengî û erjengî biqewime. Êdî rojêke ku bêyî xwîn, bêyî bûyer, bêyî êrîş derbas bibe, ne gengaz e. Wekî din bûyerên qeyranî ku bi konjûktora derveyî ve têkildar in, dema diqewimin rewş bêhtir kambax dibe.

Qeyrana ku tevahiya cihanê eleqedar dike, bêguman Tirkîyeyê jî eleqedar dike. Heger ev qeyran veguhere şerekî germ, divê di destpêkê de medya tewra xwe li hember vê yekê diyar bike. Gotinên li ser "Parastina yekîtiya Iraqê" êdî baş xuya dibe ku, ji bo parastina yekîtiya Tirkîyeyê ne. Li aliyekî bi awayekî fermî qala parastina yekîtiya Iraqê tê kirin, li aliyê din ev daxwaz bi paletên tanqan tene perçiqandin. M

Medya vê yekê wekî hewldanên insani bi nav dike û gelan dixapîne. Ev yek ji bilî piştigiriya şer pê ve ne tiştek e. Medyaya ku ji kevneşopîya Asyaya Navîn li ser hespan hatiye, bi vê yekê dixwaze çandekê biafire.

Bêguman piştî ku 7 hezar leşker, bi sedan zerîpoşên (cemseyên) zirxî xistine başûr, diyar e ku ji medyayê alikariyê û piştevanîyêke xurt digire. Rojnameya Sabahê di nûçeya xwe ya roja 10'ê reşemiyê de, kurdên ku ji ber xeternakiya berfende (aşit) reviyane, wekî penaberên ku ji sînor reviyane dan xuya kirin.

Di heman rojê de, dema me ev dîmen di ATVyê de temaşe kir, me tê derxist ku ew kesên ku ATV nîşan dide gundiyên başûrî ku di sala 1991'ê de ji başûr hatine û li derdorê gundê Doganyurt a Şemzîna Colemanê bi cih bibûn, bûn. Ev yek ji bo çapemeniya birjuwa nîşana rezaletê bixwe ye.

Di vê pêvajoyê de, me bala xwe da hin bûyerên din. Dagirkirina Navenda Giştî ya HADEP'ê û di serî de Serokê Giştî Murat Bozrak, girtinê tevahiya rayedarên navenda giştî ya HADEP ê. Kuştina Hîşyar Ağaoglu û înfaza li Fatîha Stenbolê çend mînak ji bûyerên erjeng bûn.

Medya birjuwa ku ji bo înfazê li çepikan xist, wey li wan ku lehengiya polîsan anî zimên. Ka tevahiya medyayê û nivîskarên quncikan dixwestin bi ser înfazan de biçin. Digotin: "erjeng û rezalet." Gelo ji dagirkirina Navenda Giştî ya HADEP'ê û înfazên bêdarêz erjengtir û rezaletir tiştek heye.

Divê em vê rastiyê baş binîn zimên. Cîneyetên ku di rapora Susurlukê de derbas dibin, niha ne bi awayekî faîlî meçhul lê bi awayekî vekirî tene kirin.

Li Tirkîyeyê di politikayên dewletê de çi guheriyê? Di nav têkoşîna kesên ku dixwazin biguherînin û kesên ku naxwazin biguherînin, de em dê bibin derîgê rastiyê.

7 reşemî 1998 Şemî:

ARMANC: PARVEKIRINA ROJHILATA NAVÎN E

Serokwezîrê Îngilistanê Tony Blair, li xwe mikur hat ku, armanca Îngilistanê û Amerikayê guhartina dirûvê Rojhilata Navîn e. Serokwezîrê Îngilistanê Blair, piştî hevdiştina bi Serokê Amerikayê Bill Clinton re daxuyand ku, Îngilistana nû û Amerikaya nû cihanê nû û Rojhilata Navîn a nû dixwazin. Clinton û Blair piştî daxuyaniyêke çapemeniyê dane zanîn ku, ew ji bo tevgerê li dijî Iraqê amade ne. Li hêla din tê gotin ku Blair ji bo ku helwesta dewleta xwe ya êrîşkar veşêre, der barê operasyona Iraqê de dixwaze gelê îngilîz îkna bike.

8 reşemî 1998 Yekşem:

ÇEK DYA'YÊ FIROTIN

Hate ragihandin ku, çekên di destê Iraqê de yên ku dibin sedema aloziyan li Kendavê, ji hêla Almanya û Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê (DYA) ve hatine firotin. Dîsa li gorî van îdiayan, 40 hezar çekên kimyewî û biyolojîk ku di destê Iraqê de ne, tevî ambargoya Dewletên Yekbûyî hatine firotin. Li hêla din li gorî hin derdorên pîspor, wê di operasyonêke ku Amerika li dar bixe de depoyên çekên kimyewî bibin hedef, lewre jî wê gelek kesên sîvil bi gazên kimyewî jiyana xwe ji dest bidin. Li gorî heman pîsporan zanyarên amerîkî bi navê 'VX' gazeke ku ji tabûn, saman û sarîne sê caran bi xetertir in, çekirine.

9 reşemî 1998 Dûşem:

OPERASYON NE ÎNSANÎ YE, LÊ LEŞKERÎ YE

Dewleta tirk hewldanên xwe yên ji bo avakirina 'Herêmeke Tampon' bi lezginî didomîne. Lewre jî bi hinceta rêlibergirtina penaberên başûrî, heft hezar komando, ji Qilalan û Çelê ketine nav başûrê Kurdistanê. Her wiha hêzên artêşa tirk, gelek panzerên ku ji kewçêra sala par ve li Zaxoyê dabûn bicihkirin, şandin ser xeta Derkar-Batufayê. Dewleta tirk ji roja destpêkê

heta îro dibêje ku, operasyon ji bo alîkariya insani ye, lê heta niha di warê tenduristî û xurekan de tu amadehî nehatiye kirin. Li ser vê yekê çavkaniyên herêmî radigihînin ku, bi komandoyan alîkariya insani çênabe. Her wiha sînor ji bo derbasbûna rojnamevanan hatiye qedexekirin.

10 reşemî 1998 Sêşem:

DEWLETA KURD A DEMOKRATİK

Piştî hewldanên Tirkîyeyê yên ji bo dagirkirina başûrê Kurdistanê, hêzên Kurdistanî daxuyandin ku, dewleta tirk plan dike ku bajarê Musul û Kerkûkê bixe bin destê xwe. Rêxistinên Kurdistanî gotin ku, heger ew bîn cem hev û yekîtiya xwe ava bikin, dê rewş biguhere û serkeftin jî dê ya wan be. Hêzên kurd bang li PDK'ê jî kirin ku aştiyê pêk bîne.

Li hêla din ji fermanarên ARGK'ê Nizamettin Taş daxuyand ku, qeyrana dawî jî hêla Amerikayê ve hatiye afirandin. Taş got ku, divê kurd bawerîya xwe bi xwe binin, ne li Tirkîye û Amerikayê. Taş gotinên xwe wiha domandin: "Dî grîza kendavê ya sala 1991'an de kurd hatin xapandin. Lê îro Amerika ji tevgera îslamî û şoreşgerî ditirse, lewre jî bi alîkariya PDK'yê, berê xwe dide serhildanan. Divê tu car hevî bi DYA yê re neyên girêdan." Fermanarê ARGK'ê Nizamettin Taş da zanîn ku, Tirkîye bi riya Tirkmenan dixwaze hêza xwe li başûr bi cih bike û wê derê dagir bike. Taş jî bo Amerikayê jî got ku, DYA dixwaze şoreşa kurd tîk bibe. Heger Amerika êrîş bibe ser Amerikayê, dê ew ji bo ku Kurdistanê demokratîk ava bibe hewl bidin xwe.

11 reşemî 1998 Çarşem:

QEYMEQAM DA KUŞTIN

Danişîna li ser kuştina Serokê HADEP'ê Darahênê (Genç) Hîşyar Ağaoglu roja 10'ê reşemiyê



Rêlibergirtin û zordariyên li ber Rojnameya Ûlke Gündemê didomin.

dest pê kir. Di danîşînê de Ayhan Yılmazê ku Ağaoglu kuştibû, got ku, qaymeqamê Darahênê jî bo ku Hîşyar Ağaoglu bikuje, teklîfa peyran li wî kiriye. Ayhan Yılmaz dibêje: "Heger bê xwestin ez dê dîsa mirovan bikujim." Serokê dadgehê Şaban Altınışık nehişt ku, gotinên Ayhan Yılmaz, ku li ser polîsan gotin bê nivîsandin û xwest ku rê li ber axaftina kujer Yılmaz bigire.

Birayê Hîşyar Ağaoglu, Nihat Ağaoglu der barê kuştina birayê xwe de wisa got: "Rojekê beriya bûyerê Ayhan Yılmaz tê mala birayê min û çêran dike, wê gavê jimbira min Mûjgan Ağaoglu li polîs digere (telefon dike), lê polîs der heqê vê yekê de tu tiştî nake. Sae-tek beriya bûyerê polîs dibêje ku, li dibistana razangê şer derketiye, lewma jî kolanê ji eşafan re digire." Her wiha Nihat Ağaoglu dibêje ku birayê wî rewşenbirekî kurd bû lewre jî bûye hedefa vê êrîşê.

12 reşemî 1998 Pêncşem:

KANI YILMAZ HATE BERDAN

Siyasetmedarê kurd Kani Yılmaz, ku 3 salan di girtîgehên Îngilistan û Elmanyayê mabû, roja 11'ê reşemiyê hate berdan.

Dadgeha bilind a Eyaleta Celleyê ku nêzikî bajarê Hannoverê ye, tevî serdozgerê fedaralî û parêzeran li hev çivîyan û 7 sal û 6 meh cezayê hepsê li Kani Yılmaz birin, lê pişt re dadgeh biryar girt ku ewê Yılmaz bi-şert tehliye bikin. Her wiha dadgeha bilind derheqê Kani Yılmaz de ku hatiye gotin: "Yek ji serekên rêxistina lêvekere" ji dosyayê derxist.